

Mifteya hebûna me Zimanê Kurdî



Koçberî di dîroka Kurdan de xalekî sereke ye. Ne tenê li "weletên xerî-biyê" di welatê xwe de jî koçber bûne û jî her mafî bêpar mane. Ji wan mafan herî girîng û diyarker jî, perwerdehî ye.

Perwerdehiya bi zimanê dayikê bi çend minakan li Ewropayê pêk hatin. Her wiha dergûxaneyên jî bo zarokan jî li çend deveran wekî modelek hat ceribandin. Gelo di wan modelan de zarokan bi zimanê dayikê pêş dikevin? Ji bo zarokan gaveke erênî ye an na? Gava zarok baş fêrî zimanê serdest dibe ev tê wateya ku serketî? Zarokên ku jî perwerdehiya zimanê dayikê bêpar dimînin li rasti kîjan pîrsgirêkan tînin?

Li Bakurê Kurdistanê û Rojava derbarê perwerdiya bi Kurdî û alternatîf de gavên mezin hatin avêtin. Lê li gorî şert û mercên Ewropayê rewşa heylî jî bo zarokên Kurdan ne bes e.

Di vê hejmara PolitikARTê de mamoste, civaknas û pedagogan jî me re modelên alternatîf û girîngiya zimanê dayikê di perwerdehiya zarokan de nivîsandin, vegotin.

Heviya me ew e ku bi rêya wan guftugoyan dê û bavên Kurd ên koçber û hindekaran di warê giringiya zimanê dayikê de hê baldar û hestiyar bin û di dibistanan de piştevanîyê xurt bidin zarokan.



Dimenek ji payîza Hindîstanê ...

naverok...

Têkili bi zarokên trawmabûyî re/

Mehmet ATAÇ Rûpel 4

Perwerdehî, penaberî û nîrxên neteweyî/

Mülkiye BİRTANE Rûpel 5

Dibistan û zarok di navbera dijberî û alîkariyê de ye?/

Selim Ferat Rûpel 6

Duzimanî ne kêmasî ye/ **İbrahim BULAK** Rûpel 7



Jiyan
bi Kurdî xweş e
A. Selam BARAN
Rûpel 8-9

Demokrasî jî dergûxaneyê destpê dîke/

Luqman GULDIVÊ Rûpel 10

Li Ewropayê rewşa perwerdeya Kurdî/

Abdulkadir ULUMASKAN Rûpel 11

Rêwîtiya Moskowê/ **Tosinê REŞÎD** Rûpel 12-13

Sirûda hêviyê: Bilbilê Dilşadî/

Cemal TÎRÊJ Rûpel 14

Êşê bê wext/ **Resûl Baltacı** Rûpel 15

Herausgeber:

Medya Presse-und Werbeagentur GmbH
Hans-Böckler-Str. 16
63263 Neu-Isenburg

Geschäftsführer:

Izzet Akcin

Ver.Redakteur:

Özgür Reçberlik

politikart@yeniozgurpolitika.org



Foto: Emrah OPRUKÇU

Ji bo jîndaran keleha herî bi ewle û aram, dayik e.

Li Ewropa daxwaza Kurdan a ji bo perwerdeya Kurdî hate qebulkirin. Ev yek helbet pêşketinekî girîng bû. Lê Kurdên li Ewropa dijîn ew giraniya ku di siyasê de nîşan didin, di mijara zimanê zikmakî de pêşnexistin. Bê guman ji bo zimanê zikmakî xebatên girîng hatin kirin, lê mixabin ev xebat bi qasî tê xwestin nehatin birêxistinkirin.

"Perwerde ne amadekariya jiyane ye, jiyana bixwe ye." (John Dewey)

Goethe dibêje, "Heke hûn muamele bikin bi ferdêkî/ê re weke mirovê ku divê bibe û dikare bibe, hingê wê bibe mirovê/a divê bibe û dikare bibe". Ev yek, gotinekî cewherî ya ku girêdana armanc û rêbaza perwerdeyê ifade dike, lê belê ji bo baş were fêmkirin, divê detayên wê ji werin gotin. Her weha naveroka civakî ya ku perwerde gihîştîye ji tam di wê xalê de xwe dide der.

Divê têgehên perwerde û hindekariyê ji hev were cihêkirin. "Hindekari" encama çalakiya perwerdeyê ye. Ev dihele ku hunerên ew kesê ku perwerde dibîne derkeve holê, were pêşxistin û karibe vi hunerî tevî nav civakê bike.

Di wateya fîreh de perwerde, tevahî pêvajoyên civakî yên ku nîrx, bawerî û reyên jiyane ferî mirov dikin. Bi wateyekî din, hemû pevajojên pêxistinê ye ku di warê civakî de tê xwestin ew kes xwe bigihîne.

Dema kesek tevî perwerdeyê dibe, bi sistema nîrxên malbatê destpê dike û di pêvajoya dibistanê de van bi nîrxên din yê civakê re dike yek. Di wateyê de em karin bêjin ku perwerde, li gorî pêdiviyên sistemên civakî formatkirina hest û raman, tevger û ferasetên kesane. Jiber vê yekê her sistem di xwezayîya xwe de nêzikatiyên perwerdeyê ji li gorî pêdiviyên mirovan pêş dixê.

Di serdemên feodalîteyê de ku hê teknolojiya nûjen tunebû, pêwistî bi perwerdeya ji derveyê sistema dibistanê tunebû. Modernîteya kapitalîst ku pêdiviya xwe bi teknolojiya belave re heyî ji, derfetên perwerdeyê ku di destê kategoriyên çînî ya aristokrat û ruhban de ye dixê xizmeta kapitalîzmê. Ji bo vê yekê ji perwerdeyê belav dike û digihîne tevahiya civakê. Sistemên dibistanê ya îroyî, xwedî serboriyekî wiha ye.

Em dikarin bêjin, ku fabrikayên sereke ên perwerdeya civakî; malbat û dibistan in. A yekemîn zêdetir şêwe dide weke nîrxên exlaqî û wijdanî, toreyên malbatî. Di wateyê de perwerde, "ji mirovekî/ê re şêwê dayina pêwist zêdetir, pêvajoya bîdestxistina çand e." "Em dixwazin xwe bigihînin zanyariyên ku ji aliye mirovên din ve hatiye avakirin û em ji vê pêvajoya çandgirtine re dibêjin, perwerde."

Perwerdeya dibistanê ku li nava mufredata dibistanê hatiye bicîhkirin ji, perwerdeya fermî a sistemê ye ku li ser tîgîna "hemwelatî"yê hatiye rûniştandin. Sistema sosyo-aborî ku derfetên perwerdeyê bîdest xistiye, di wateyekê de li ser navê



Perwerde û zarokên Kurd ên li Ewropa



Xwe Metin AYÇİÇEK

serdestan weke piştvanê bîngêhî yê avahiya civakî derdikeve holê. Jiber vê yekê ji perwerdeya dibistanê, pergala herî girîng yê sistema kapitalîst a modern e û ev pergala di bin kontrola dewletê de tê girtin. Perwerdeya dibistanê, rewşa sazîkirina perwerdeyê ye, awayeke perwerdeya formal e. Yanî perwerdeyekê armanc û rêzîkên wê ji aliye saziyên desthilatdaran ve ji berê ve tê diyarkirin û bi zanebûn, bi plan, bi armanc û bi program tê meşandin.

Perwerdeya netewa serdest û asimilasyon

Bi gelemperî di navbera perwerdeya malbat û ya dibistanê de ahengek heye; hevdu destek dikin, ji hev bibandor dibin, hevdu bandor dikin. Lê car caran dibe ku di navbera armancên perwerdeya malbat û dibistanê de cudahi û heta dijîti ji werin ditin. Weke minak, li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyê di serî de Kurd, beşên civakî ku weke "kêmnetew" tî nasîn rastî van politikayan tî. Politikaya perwerdeya Komara Tirkîyeyê ji bo yê nê ji netewa Tirk a serdest in û ne ji mezheba Sunî-Henîfî ya serdest in, bi temamî asimilasyonê dimeşîne. Gelê Kurd, nîrxên xwe yê nasnameya netewî ji nav perwerdeya nava malbatê digre, lê sistema dibistana dewletê ya fermî, bi awayekî xedar politikaya Tirkîkirinê dimeşîne û hewl dide mejiyê wî/ê biguherîne. Zarokên Kurd, nîrxên nasnameya qewmî yê ku ji ferdên malbatê fêr bûne vedîşêrin, di nava sistema dibistanê de nîrxên nasnameya ku netewa serdest dixwaze bide digre. Ji ber vê yekê di navbera her du nasnameyan de nakokiyên cidî dijîn.

Em ji çirokên herî bi êş dizanin ku civatên Ermenî li nav malbatê nîrx û libatên ola Filehî fêr dibûn, lê di sistema perwerdeya dibistanê de baweriyên xwe vedîştartin û neçar dibûn fêrî perwerdeya ola mecbûrî (Islam) bibin.

Halbûkî ji hêla netewa serdest ve qala dijrabertîyeke di navbera wan her du perwerdeyê de (ji bilî istisnayên muxalefata civakî afirandî) kirin, ne gengaz e.

Malbateke ji netewa serdest, dema çanda nasnameyê

dide, bîvê nevé li gorî pîvanên nijadperestiyê dide û bi vî awayî xwe perwerde dike.

Peyva perwerdeyê, di Tirkî de ji koka 'xwarkirin'ê hatiye. Ev kok, tê wateyê weke ba dan, pêkanîn, fêrkirin, xwedîkirin, pêşxistin, hinkirin, girtina bin hikûmanî, bi bînxistin, şikandin û beralikirine. Wê demê em dikarin tarîfa perwerdeyê wisa misoger bikin: 'Perwerde, di wateya berfireh de tevahî pêvajoyên civakî ne ku kesane bikaribin pîvan, baweriyên civakê û rîyên jiyane bîdest bixin. Bi kurtasî, mirov dikare weke 'pêvajoya pêşxistina nêzikatiyê û libatên tînxwestin' ji bîlêv bike."

Pîrsgirêkên perwerdeyê

"Du encamên teza 'perwerde mafekî mirovan e' heye. Ya yekemîn; dev ji maf naye berdan. Ji ber vê yekê peyva "Ez perwerde naxwazim", nabe mijara gotinê. Ya duyemîn; divê yekîtiya siyasî, yanî dewlet derfet bide ku hemû welatîyên wê ji mafê perwerdehiyê sude werbigirin. Tîşt a ku ji bo kesane maf e, ji bo dewletê ji erk e." (Omer Naci Soykan, Axaftina Sempozyuma "Perwerdeya Azad", Di Pêvajoya Globalbûnê de Çewaniya Pîrsgirêkên Perwerdeyê yê Felsefî, 2009, rûpel 296 Oslo-Norwec Pîrsên XX.IPO)

Pîrsgirêka herî esas ji ev e. Weke ziman, perwerde ji mafekî mirovî ye û divê her ferd xwedî maf û derfetên perwerdeya bi zimanê xwe yê zikmakî be. Mixabin pîr-raniya dewletên netew-unîter di zimanê fermî de îsrar dikin, li ser netew û gelên din politikayên inkarkirina ziman dimeşînin. Ev politîka li welatên Ewropa ji tê nîşandan. Di bin navê entegrasyonê de politikayên asimilasyonê tînxwestin û gelek caran tê gotin, "Hûn mecbûr in li Elmanyayê bi Elmanî bipeyivin."

Pîştî ku Wezîra Perwerdeyê ya Elmanyayê Nordrhein Westfalenê (NRW) Barbara Sommer got, "Zarokekî/ê tevî axaftina zimanê zikmakî, divê di aliye nivîsê de ji fêrî zimanê zikmakî be. Eger we yekê pêk bîne di dema pêş de di warê pişeyî ji wê pêşiya wî vebe û bi şens be. Pîrzi-manî dewlemendiyeke çandî ye û li Ewropayê nîşaneyê globalbûnê ye." Bi vî daxuyaniya Sommer, ji bo zimanê zikmakî gavên nû hatin avêtin. Daxwaza Kurdan a ji bo perwerdeya Kurdî ji hate qebulkirin. Ev yek helbet pêşketinekî girîng bû. Lê Kurdên li Ewropa dijîn ew giraniya ku di siyasê de nîşan didin, di mijara zimanê zikmakî de pêşnexistin. Bê guman ji bo zimanê zikmakî xebatên girîng hatin kirin, lê mixabin ev xebat bi qasî tê xwestin nehatin rêxistinkirin. Şaş e ku mirov vê yekê weke tene kêmasiyên civata Kurd ên li diasporayê bigire dest. Weke minak; beşeke girîng ya civata Kurd îro ji bi nasnameyên dewletên dagirker dijîn. Ev ji pîrsgirêkên cidî bi xwe re tine. Bi salan e daxwazên Kurdan yê bi vî awayî, bi hinceta 'Jixwe hûn Tirkî dipeyivin û dersên Tirkî di dibistanan de tînxdayin' hatiye redkirin.

Ya duyemîn; li Ewropayê ji ber ku zimanê Kurdî tenê di nava civaka Kurd de tê axaftin, di jiyana kar de naye bikaranîn û bî bandor dimîne. Ev yek ji dihele ku Kurd zimanê welatê ku lê dijîn bipejirînin. Di vî warê de gavên cidî hatine avêtin, lê gelê Kurd ku hejmara wê li Elmanyayê zêdetirî milyonekî ye, êdî divê dest bi xebat û bernamêyek berfireh ku bikaribe zimanê Kurdî pêşbixwe bike û zimanê xwe biparêze. Divê bernamêyeke demdirêj a vî xebatê were amadekirin. Dê û bavên ku li hemberî politikayên asimilasyonê li berxwe dane û di şert û mercên herî dijwar de zarokên xwe fêrî Kurdî kirine, divê li ser xakên Ewropayê ji van hewl-danên xwe bîdominî. Rê û rêbazên li Ewropayê yê demokratîk divê werin bikaranîn û pêşiya zimanê Kurdî were vekirin. Di vî mijarê de her zarokekî Kurd ku fêrî zimanê xwe bibe, di heman demê de wê nîrxên xwe yê netewî ji bipareze. Tevî vî yekê wê serketitîr be. Li çihana ku tê gotin global bûye, hebûna zimanê hatine azadkirin, wê xîzmîti pêşketina çanda civakî ji bike.

Têkilî bi zarokên trawmabûyî re



Mehmet ATAÇ

Trawma weke kul yan ji bi awayekî din birindarbûnê tê nasîn. Trawma bi riya bûyerên xetera wan li ser jiyana mirov bandora xwe dîke û ne di demeke diyar de pêk tê. Di vê demê de mirov xwe bê hêvî dibîne, dikeve nav tirsê û ji erka xwe ya parastinê bê par dimîne.

Trawma ya derûnî li gorî zan-yarên Elman, G. Fischer û P. Rideser di nava rewşeke xeter û parastina cewherî ya kesekî de pêk tê. Dema bûyerê trawmatîk tê serê kesekî, hisên windabûnê pê re peyde dibin. Hewldanên parastinê dixurifin û bi heman awayî baweriya wî bi xwe û gerdûnê zelûl û ne ewle dibe.

Li gorî terîfa Rêxistina Tendûristiyê ya Cîhanê (WGO), trawma, birindarbûna his û ya ku bi riya bûyerê bi teh-lûke li ser mirov çêbûye û kesê trawmabûyî heyrî ye (bi-nêre ICD- 10).

Weke minak, êrîşên li dijî mirovekî, şahidiya kuştina mirovekî, bûyerê bi mirinê bi dawî bûbe, agahiyeke gelek zehmet, yan jî şahidiya li erdhejê.

Bingeh û çavkaniya trawmaya derûnî stres e. Bi van her sê xalan bûyera trawmatîk diqewime:

- Ku mirov nikaribe li dijî bûyerê xwe bigire û nikaribe li ber xwe bide (no fight)
- Heger mirov nikaribe ji bûyerê bireve (no flight)
- Heger encam quflîn û parçebûna têgihînê be

Rewş û serhatiya trawmayê

Zaroka ku pêwendiyên wê yên sereke ji dayikê neyên wergirtin, jê neyê hezkirin û ji daxwazên wî re rêz neyê girtin, hingê ew zarok pêwistiya parastina bi destê dayikê ji dest dide û wê demê em dikarin bibêjin ku rewşa trawmatîk pêk hatiye.

Afirandina rewşa trawmayê ji bîstekê heta nivê giyana mirovekî dikare dewam bike. Kritekên tesbîtkirina pêkhatina trawmayê ev in:

- Xetera bi bandor a li ser jiyandê
- Rewş û bûyera hati serê mirov
- Afirandina hesta bê parastin mayînê
- Têkçûn û hilweşîna kesayetiye, û têkçûna baweriya bi kesên û derdora xwe.

Kesên lê qewimî û di rewşa trawmayê de pirr caran bi van pêjnan reaksiyonê didin der:

- Hêvîman, bêzarbûn
- Tirs, tirs mirinê
- Panîk
- Şok
- Êş
- Şerm û diljêçûyîn
- Reaksiyonên bedena mirov

Mînakê ji rewşa trawmayê re:

Xemgîn 10 salî bi diya xwe re li gund dijî. Li gund bûyer diqewimin, pirr cara leşker hatine gund, zext li gund-diyar kirine û li wan xistine.

Dema ku dayika xemgîn di axaftinanên xwe de qala lêdan û êşkenceya esker û cendermeyan dîke, Xemgîn ji gotinên dayika xwe dibihîze. Li gorî axaftinê diya wî leş-ker, lêdan û êşkenceyê li Kurdan dîkin, zarokan ji dayikên wan qut dîkin û dayikan digirtin û carinan wan bi xwe re dibin û dikin girtigehê.

Ji ber ku Xemgîn wan xeberên dayika xwe dibihîze, ge-



Di rastiyê de diya Xemgînê biçûk ji aliyê leşkeran ve nehatiye girtin yan jî leşkeran êşkence li diya wî nekirîye. Ji ber ku ew bûyer li gundê Xemgîn qewimiye û diya wî gotiye çî hatiye serê gundiyan din, Xemgîn jî bawer dîke ku rojêkê bûyer were serê wî û diya wî.

lekî ji leşkeran ditirse ku diya wî ji bigirin û bibin. Xemgîn, her cara ku gotina leşkeran dibihîze, diricife, ditirse û xwe bi dawa diya xwe ve digire û xwe jê dûr naxe. Bi şev xewa wî lê diherime, di xewa xwe de carinan dibîne ku diya wî ne li cem wî ye, ew jî hev qut bûne. Xemgîn xwe êdî di ew-lehiyê de nabîne û gotina leşkeran jê re dibe sedama trawmayê derûnî.

Di rastiyê de diya Xemgînê biçûk ji aliyê leşkeran ve ne-hatiye girtin yan jî leşkeran êşkence li diya wî nekirîye. Ji ber ku ew bûyer li gundê Xemgîn qewimiye û diya wî go-tiye çî hatiye serê gundiyan din, Xemgîn jî bawer dîke ku rojêkê bûyer were serê wî û diya wî.

Xemgînê 10 salî dema leşkerêkî Tirk dibîne diricife, di-bizde, xwêdan dide û zikê wî diêşe. Tevî ku ti tişt nehatiye serî wî ji reaksiyonên wî yên bedenê weke ku zikê wî diêşe yan jî ditirse nişana trawmayê ne.

Zarokên Kurdan şahidê gelek bûyerên trawmatîk in. Li Kurdistanê bûyerên weke girtin, lêdan, êşkencekirin, kuştin û zextên cûr bi cûr diqewimin. Ev bûyer bandora xwe dikarin bi tenê keliyekê dewam bikin, lê dikarin heta da-wiya jiyana mirovan jî teşîra xwe dewam bikin.

Reaksiyonên trawmayê çî ne?

Nişana reaksiyonên trawmayê yên di jiyana zarokan de xwedî bandor, ev in:

- Xerabûna şiyana bi bir anînê
- Xetera li ser his û aqil
- Xerabûna kontrolkirina xwe bi xwe
- Guherandina ferasetê

Reaksiyonên trawmatîk ên derûnî li ser zarokên temenê wan di bin 5 salî re, xwe bi tirsê ji dayika xwe werin veqe-tandin, ji nişkê ve qirîn, qerisîn û bizdin, ricifnê diyar dîke.

Zarokên temenê wan di navbera 6 û 11 salan de ev re-aksiyon xwe li cem wan nişan didin: Qutkirina tîkiliyên bi derdora xwe re, dixwedemayîn (xwe asêkirina di nava sî-norên derûnî yin xwe de) û pirsgerê bala xwe dana ser tiştêkî. Pirsgerêkê nerazanê, tirs, di qaqilkê xwe de man,

xewnerêşk jî nişanên din in.

Ji bo kesên temenê wan di navber 12 û 17 salan de reak-siyonên trawmayê weke li ba kesên mezin xwe dide der:

Çilmasîna hisî, ditina xewnerêşk û kabûsan, depresiyan, dîrketin û revîna ji tiştê ku bûyerê tine bîra wan, qutkirina tîkiliyên bi kesên re û bi carekê anîna bîra xwe ya bûyerê (flashbacks).

Nexweşiya Stresê ya Piştî Trawmayê (PTSD)

PTSD bi tevgera, reftara xirab pêk tê û di bûyerên ne diyar û xeter de encam dide.

Nişanên PTSD'yê ev in:

- Jinûve hatina serê mirov a bûyerê: Wênêyên ku bû-yera trawmatîk careka din bibîr tinin.
- Xwe dana alî: Xwe vekîşandina ji dever û aktiviteyan, çilmasîna hisî
- Hesasiyeta zêdeyî hed: Pirsgerêkê xewê, kêmbûna baldayînê,

Sê beşên kesên bûyerên trawmatîk hatî serê wan hene: Kesên xwe bi xwe baş dîkin,

Koma kesên guherbar
Koma tehlûke li ser wan mayî.

Çavkanî:

- 1-Kurtuya ICD-10, Internationales Klassifikations- und Diagnosesystem von psychischen Störungen
- 2-G. Fischer& P. Riedesser, Lehrbuch der Psychotraumatologie, 1998
- 3-Udolf, Margarete, Psychologische Praxis für Beratung und Traumapädagogik. 2012
- 4-Fischer, G. Neue Wege aus dem Trauma
- 5-Riedle, Ferber-Bauer, Gillig- Riedle: Pflegekinder
- 6-Hilfe für Kinder und Jugendliche nach Gewalt und Katastrophen, National Institut of Mental Health, USA
- 7-Institut für Traumabearbeitung und Fortbildung. Frankfurt
- 8-TraumataTransport Consult. Köln

Perwerdehî, penaberî û nirxên neteweyî

Civaka me ya li Ewropayê, gelek zarok, ciwan zimanê xwe û nirxên xwe yên neteweyî nizanin. Divê malbatên Kurdan bizanibin ku li wê derê dewlet di nav mala wan de nîn e. Wateya vê, xwe piştaftin e. Xwe piştaftin ji piştaftina desthilatdaran zêdetir zirarê dide neteweya wan.

Perwerdehî, pêvajoya hînbûna liv û tevgera mirov a ji dayikbûnê heta dawîya emrê xwe ye. Perwerdehî ji malbatê destpê dibe, bi hawîrdor, dibistan û civakê didome. Mirov tiştên baş û yên nebaş ji der û dora xwe û ji dibistanê fêr dibe û di jiyana xwe de van tiştan bi kar tîne.

Zanyar perwerdehiyê dikin du beş: Perwerdehiya berê dibistanê; ev perwerdehî ya ku mirov ji malbat û civaka der û dora xwe digire ye, û perwerdehiya li dibistanê; ev jî tiştên ku li dibistanê bi xwendin û nivîsandinê tê feribûn e.

Perwerdehî di nav malê de bi hînbûna zimên û bi liv û tevgeran destpê dibe. Ziman, amûra îfadekirina hest û ramanên mirov a bi peyv, sembol û tevgeran e. Ziman ji aliyekî ve çanda gelekî xwedî dibe, ji aliyekî ve jî bi çandê, xwe xurt dibe. Ji ber ku ziman mirateya çandê ye, civak bi ziman û nirxên xwe yên çandî xwe digihînin nîşên pêşerojê.

Zarok di destpêkê de zimanê zikmakî bi awayeke xwezayî û sistematîkî ji dayik, malbat, û netewa xwe hîn dibin. Ji bo vê jî zimanê zikmakî ne tenê zimanê ku dayik diaxîfe ye. Ev ziman bi çand û hawîrdora ku mirov di nav de diji ve jî girêdayî ye. Di encamê lêkolînê ku hatine kirin de; heke ziman û çandeke serdest di jiyana zarokan de hebin, tê gotin ku zarok wan fêr dibin û dibin zarokên yek zimanî û çandî. Pê re ziman û çanda xwe wenda dikin û perwerdehiya ku zarok berê dibistanê digire jî hêdî hêdî ji holê radibe.

Zarokek heta şeş saliya xwe, beriya ku biçê dibistanê li malê bi zimanê zikmakî tê perwerdekirin. Ev perwerde wek perwerdehiya asayî û xwezayî tê binavkirin. Di vê pêvajoyê de zarok dikare 2000 peyvan bi kar bîne. Ev zimanê axaftinê ye û ji bo zarokan dibe bingeha perwerdehiya dibistanê. Gava ku dest bi dibistanê dibe, li ser vê bingehê rê û rêbazên xwendin û nivîsandina zimanê xwe hîn dibe. Ev jî dibe perwerdehiya bi zimanê zikmakî. Heke li wî welatî zimanê din jî hebin, zarok dikarin wan jî wek zimanên duyemîn, sêyemîn û hwd. fêr bibin.

Zanyar, zîmnanas û lêkolîner diyar dikin ku kesên bi ziman û çanda xwe perwerdehiyê dibînin, zimanên din zûtir û hêsantir fêr dibin û di jiyana xwe ya rojane û ya dibistanê de mirovên serkeftî ne. Her wekî din bi civaka xwe û ya gelên din re di nav danûstaneke baş de ne û pirsgrêkan najin û nadin jiyîn. Rêjeya suncan a di nav civakê de kêmtir dibe û mirov bi hev re di nav aramiyê de dijîn.

Perwerdeya zimanê dayikê şert e

Îro Tirkiyê ji di nav de li hin welatan perwerdehiya bi zimanê dayikê nayê dayîn an jî hatîye qedexekirin. Ev jî binpêkirina mafê xwezayî û esasî yê zarokan e. Mafê her kesê jî heye ku ziman û çanda xwe hîn bibe. Hînbûna zimên tenê bi axaftina wî nabe. Divê rêbazên wî yên rêzîmaniyê, peyv, biwêj û gotinên pêşîyan hemû di nav pergaleke rêkûpêk de bên hînbûn an jî hînkirin. Ev jî bi perwerdehiya bi zimanê dayikê mimkûn e.

Di vê sedsala ku em tê de dijîn de, êdî jiyana li welatê xwe wêdetir, gelek mirov jî ber şer û pevçûn, pirsgrêkên aborî, perwerdehî û siyasî mecbûr dimînin ku welatê xwe dûr dikevin û dibin penaber.

Ji ber ku jiyana welateke din jî ya welatê wan cûdatir e, penaber li welatên biyanî pirsgrêkên wek aborî, psikolojî, ziman, tenduristî, perwerdehî, huner û çandî dijîn. Kesên ku çand û huner, ziman, dirêk û rastiya civakî ya gelê xwe baş bizanibin, dikarin zûtir çand û nirxên civakê din jî fêr bibin. Ev e jî him bibe sedema nedurkîtiya çand û nirxên xwe, him jî jiyaneke hêsantir û bê pirsgrêk a li wî welatî. Ev kes dikarin bi vê rêbazê têkiliyên xwe yên bi netew û welatê xwe jî germ û zindî bigirin.

Penaberên ku ji welatên cur bi cur koçberî welatên din dibin, tevî xwe çand û nirxên xwe jî dibin wan welatan. Pîrr çandîya penaberan li wan welatan dibe dewlemendiyeke bêhempa. Bi vê dewlemendiyê ew welat heke bikaribin ji bo penaberan perga- leke ku maf û azadiyan diparêze, ava bikin, dê bibin nimûneyeke



demokrasiyê.

Pirsgrêka sereke ya li welatên biyanî di destpêkê de ziman e. Mirov ji bo ku jiyana xwe bidomîne, debara xwe bike, mecbûr e ku têkiliyê bi kesên din re daye û bide bistîne. Ev têkili jî bi zimên destpê dibe.

Bingeha serketinê zimanê dayikê ye

Li Tirkiyeyê Kurd bi salan e ji bo zimên têkoşîneke bêhempa didin. Di vê pêvajoyê de jî bi gelek kuştin, girtin, komkuji û koçberiyê re rû bi rû mane. Hinek li nav Tirkiyeyê belav bûne, hinekan jî berê xwe dane welatên cur bi cur. Ji ber van zîlm û zordarî, zext û piştaftinê pergala desthilatdar a Tirkiyeyê gelek Kurd ji Kurdistanê koçberî Ewropayê bûne. Li ser vê esasê, em dikarin jî gelê xwe yên ku koçberî wan welatan bûne re pêşniyariya xwedî derketin û hînbûna çand û zimanê xwe yê neteweyî bikin.

Nirxa herî girîng a netewekê zimanê wî ye. Zimanê Kurdî li hember hemû zext û qedexeyan heta îro tenê bi axaftinê hatiye parastin. Li her çar parçeyên welêt dengbêj û dayikên Kurdan bi kilam, lorîn, çirok, metelok, biwêj û gotinên pêşîyan zimanê ku bi tundî hatiye qedexekirin, gihandine vê rojê. Divê li welatên biyanî jî bê parastin ku nîşên nû wenda nebin û ji netewa xwe dûr nekevin.

Ziman çawa wenda dibe û netewek çawa jî holê radibe?

Dê û bavên zarokan jî ber ku di xwezayî zarokên wan zimanê welatên ku lê dijîn fêr bibin û pirsgrêkan nejin, dibêjin ne hewce ye ku zarok zimanê xwe yê dayikê hîn bibin. Ev nêrîneke şaş e. Heke bê xwestin ku zarokên wan jiyaneke baş bijîn, divê di destpêkê de zimanê xwe hîn bibin. Ev yek hem jî bo ku netewa xwe biparêzin hem jî di jiyana xwe de serkeftî bin, rêbaza zanistiyê ye.

Dibe ku gelên din terciha xwe ji aliyê zimanê wî welatî ve bikin, lê, ji ber ku gelê Kurd li seranserê cihanê gelekî bi welatê lê bê dewlet e, hewcedariya wî bi xwedîderketina zimanê wî heye ku netewebûna xwe bikaribe biparêze. Li welatên ku lê dijîn, heke derfeteke biçûk a ku mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê dibe hebe, divê wî mafî bi kar binin.

Wek nimûne; li Swêdê li dibistanan bi 138 zimanan perwerdehî tê dayîn. Ji ber ku gelek penaber li wî welatî dijîn û li wê derê demokrasi û azadiya mafan heye, her zarok bi zimanê dayika xwe perwerde dibe. Zarokên Kurd jî li Swêdê perwerdehiya bi Kurdî dibînin. Di heman demê de zimanê fermî yê wî welatî û zimanê biyanî yên welatên din jî fêr dibin. Bi vê rêbaza hanê zarok dibin kesên pîrzîmanî.

Li gor qanûnê welatên Ewropî rêbazên cuda hene. Kurdên ku li wan welatan dijîn divê di serî de li ser wan qanûnan lêkolîn bikin û ji bo zarokên xwe perwerdehiya bi zimanê xwe bike-

wazin. Em dizanin ku ew zarok jî bo ku ji çand û jiyana gelê xwe dûr nekevin û bi civaka wî welatî re jî pirsgrêkan nejin, mecbûr in her du zimanan jî fêr bibin.

Divê Kurd li Ewropayê çand û zimanê xwe biparêzin

Berpirsariya mezin a dê û bavan ew e ku bi zarokan re bi zimanê dayikê biaxîfin. Ji bo ku çand, ziman û zarokên wan li welatên biyanî nehelin, xwedîderketina wan lazim e. Li ser rûyê cihanê gelek ziman û nasname jî ber politîkayên desthilatdaran yek bi yek wenda bûne. Divê Kurd jî bi destên xwe nekevin vê rewşê. Çanda serdest a welatên biyanî bivînevê, bandora xwe li ser çandên din dikin. Malbatên Kurdan ên li Ewropayê jî din nav mala xwe de bi zimanê wî welatî diaxîfin. Zarok jî di demeke kurt de fêrî zimanê serdest dibin û êdî jî ziman û çanda xwe durtketî- neke berbiçav rû dide.

Em dizanin ku îro çanda herî paqij û dewlemend a gelê Kurd e. Kurdan heta roja îroyîn bi têkoşîna xwe nirxên xwe yên civakî û rûmeta gelê xwe parastine. Lê, wekî ku tê zanîn, ev sed sala teknoloji û modernîteya kapitalîst van nirxan yek bi yek tune dikin. Rewşa herî berbiçav jî rastiya civaka me ya li Ewropayê ye. Gelek zarok û ciwan zimanê xwe û nirxên xwe yên neteweyî nizanin. Tiştê herî mirov ditirsîne û dixê fikaran jî zarokên Kurdan ên ku ji Tirkiyeyê çûne, bi Tirkî û zimanê biyanî, yên welatê ku lê dijîn, diaxîfin. Divê malbatên Kurdan bizanibin ku li wê derê dewlet di nav mala wan de nîn e. Wateya vê, xwe piştaftin e. Xwe piştaftin jî ji piştaftina desthilatdaran zêdetir zirarê dide neteweya wan.

Gelo mirov an jî malbatek tenê bi serê xwe dikare ziman, çand û nirxên xwe biparêze?

Belê, malbat heke bi biryar bikaribe li ser ziman û çanda xwe raweste, dikare hemû nirxên xwe yên neteweyî biparêze. Her malbatek jî hêla xwe ve dikare hin tiştan bide civaka xwe û civakbûna xwe xurt bike. Ev têkoşîna jiyana azad, demokratîk û wekhevîyê ye. Bi pîvanên vê jiyandê, têkiliyên di navbera kes û civakê de tên danîn. Civakeke azad bi jinên azad, pêk tê. Jinên Kurd ku heta îro çand, ziman û nasnameya xwe parastine, îro jî bi zanyarî rêxistina xwe ava kirine. Bi vê rêxistinbûne pergala civaka demokratîk, ekolojîk, zayend parêzî, ehlaqî û politîk didamezîrin.

Jinên Kurd jî bo zimanê gelê xwe jî mecbûr in li welatên biyanî vê rêxistina xwe ava bikin. Heke mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê li welatê ku lê dijîn, tunebe, dikarin bi rêxistina xwe ya zimên zarokên xwe li komele an jî malan perwerde bikin. Em dizanin ku li gelek welatan, komele, sazî û dezgehên Kurdan hene. Li cihên ku ev sazî tune, di serî de jin û ciwan dikarin van sazîyan ava bikin. Ev sazîyên sîvil cihên ku mirov bikaribin xwe bi hêsanî bi rêxistin bikin in. Li van sazîyan bi her awayî çanda xwe dikarin hîn bibin û biparêzin. Zarok jî dê bi têkiliyên malbatên xwe nêzikî hev bibin û ji hevdu nirxên xwe yên civakî hîn bibin.

Dibistan û zarok di navbera dijberî û alîkariyê de ye?



Divê dê û bav di ey-nîkê de weke yek wêne bèn nîşandan.

Dema zarok li ey-nîkê binerin, eynîkê du perçe nebinin. Dema di eynîkê de dê û bav wek yek wêne neyên xuyakirin, dê zarok xwe weke du perçe bibinin û ewê yekem bibe sedemê ne hêzbûna zarokan di dibistanan de jî.



"Divê perwerdekar (dê, bav û mamoste) ne zarokê, zarokatiya wî/ê bibînin!"
(Johann Wolfgang von Goethe)

Destpêk

Perwerdeya zarokan, di nav malbatê de destpê dîke û di dibistanê de her berdewam e.

Heger di malbatê de dê û bav zarokên xwe bi şevyêki noşdar amadeyê dibistanê bikin, zarok di dibistanê de jî serkeftî bin. Ev serkeftîbûn, ne tenê bi notên zarokan re girêdayî ye. Mebesta serkeftinê, jî aliyê helwest û têkiliyan ve tê hesabandin. Di dibistanan de not û helwest (rabûn û rûniştin, livandin, çûyin û hatin)/ têkilî (bi mamostan û şagirtan re) hevbeş tên hesabandin.

Ji ber ku dibistan jî, beşekî jiyanê civakî ye, helwesta wê zarokan di nav malbatê de, di berdewamiyê de xwe di dibistanan de jî bîteyisîne.

Ji bo vê yekê jî, malbat û dibistan ne dijberî hev, hêzên hevbeş in. Dê û bav çiqas di têkiliya xwe bi mamostan re noşdar bimeşînin, wê zarokên wan di dibistanan de ewqas serkeftî bibin.

Hîm-bingeh: Hezîkirin û sînora nîşandan

Yek ji şertê bingehî jî bo serkeftina zarokan di dibistanan de, hezîkirin û sînornîşandana dê û bavên e.

Hezîkirin û sînornîşandan ne dijber in; hevdûî temam dikin û hêz didin zarokan. Heger dê û bav bikaribin her roj zarokên xwe ji dil bişînin dibistanê û her roj hezîkirina xwe diyar bikin û roj bi roj dema çûyin û hatinê, dema razan û rabûnê bi zarokên xwe re tesbî; sînorên zarokan destnîşan bikin; dikarin di dibistanan de jî gava yekem ji bo serkeftina zarokên xwe, bi zarokên xwe re bavêjin.

Sînornîşandan divê ne bi zorê be!

Divê dê û bav ne bêhnteng bin û divê bi bêhnfirehî û sebr bikaribin sînoran nîşanî zarokan bidin û xwe bidin qebûlîkirin. Dibe ku zarok tenê dikarin şert û mercên jiyane di carê de, fehm nekin. Du car, sê car, çar car bêjin. Dem bigrin, heta ku zarokan gotina we hilgirt û zanin ku hûn ji wan çî dixwazin; heta wê demê bi zarokan re di nav komunikasyonê de bin.

Mezin hûn in; zarok biçûk in. Hûn hîn dikin; zarok hîn dibin!

Ya gîrîng: Yekdengbûna dê û bav

Dema zarok hîn bin û bizanibin; dikarin kesan dijberê hevdû bikar binin û ji bo berjewendiyên xwe serkeftîbin. Zarok vê listîkê herî zedê di nav malbatê de; jî dê û bav hîn dibin!

Dema ku dê û bav ne yekdeng bin û nikaribin bi şert û sînorên bingehî jî bo jiyane (dema rabûnê û razanê, dema ders çekirinê di malê de, dema derketina malê û listîkê derweyê malê de û hwd.) de helwestekî hevbeş nîşan bidin, dê hevsaerî jiyanê rojanê bikeve destê zarokan. Piştî vê edî zarok dikarin dê û bav hember hevdû bikar binin.

Ji bo vê jî divê dê û bav di eynîkê de weke yek wêne bèn nîşandan. Dema zarok li eynîkê binerin, eynîkê du perçe nebinin. Dema di eynîkê de dê û bav wek yek wêne neyên xuyakirin, dê zarok xwe weke du perçe bibinin û ewê yekem bibe sedemê ne hêzbûna zarokan di dibistanan de.

Wek destpêkê de hatiye nivîsandin, hezîkirin, sînornîşandan û yekdengbûna dê û bav dibin himên serkeftina zarokan di perwerdeya malbatê û dibistanan de.

Dema dibistanê pêwîstiya gîrîng: Çavdêriya dê û bav

Divê dê û bav bizanibin, wek zarokên wan, her zarok ji malbatên cûrbecûr tên dibistanê.

Her dê û bav ne weke hevdû ne. Her malbat herçiqas dişîbin hev dî jî, di civatê de jî malbatên din cûdatir in.

"Hemû malbatên bextiyar, wek hevdû bextiyar in; her malbatêkî ne bextiyar li gor xwe ne bextiyar in" (Leo N. Tolstoy/Anna Karenina).

Çavkaniya çînî ya malbatan; bingehê her malbatê ya civatî jî hevdû cûda ye.

Bi vê jî, her zarok ji zarokên din cûda ye.

Her zarok ferdek e.

Lê roja yekem di dibistanan de; her zarok weke hevdû tên hesabandin. Ev yek jî ji bo hin zarokan, belkî jî ji bo zarokên we, astengiyekî gîrîng e.

Ji ber vê yekê jî, divê her dê û bav karêkî bingehî û tûnd bi mamosteyên zarokan re bimeşîne û ev kar her berdewam be.

Dibe ku ji bo zarokan hewcedariya alîkariyekî awarte (Sonderförderung) hebe. Netirsîn. Serî lêdan, jî bo zarokan alîkarî girtin ne şerm e. Şerm ev e ku zarok alîkarî negirin û piştê di dibistanan de ne serkeftî bin. Ev şerm jî wê bibe, şerma dê û bavên.

Karekî hevbeş bi mamosteyan re, divê weke karêkî otom were meşandin. Heke dê û bav dixwazin ku zarokên wan di dibistanan de serkeftî bin; divê dê û bav perwerdeya male û ya dibistanê wek karên hevbeş bihesibînin û herî gîrîng; çavdêrî zarokên xwe bibin!

Çavdêrî ji bo çî?

Dibe ku zarokên malbatan, di dibistanan de, di serkolanan de bi bûyerên ku nikaribin jî dê û bavên xwe re vekin, pê re bikevin nava têkiliyê.

Naveroka bûyeran bi talûke nebin jî, li ser zarokan bandoran çêbikin. Dibe ku zarok, piştî vegera malê bédeng bin; bixwazin di nav xirûfan de tenê biminin an jî bi hêrs bin û tenê biqirîn û gazîna bikin. Ev hemû nîşanên nerîhetîya zarokan in. Divê perwerdekar neçîn ser zarokan û bi sebr bin. Piştê dikarin bi zarokan re bidin û bistin. An jî zarok bi xwe werin û behsa pîrsgirêkan bikin.

Dibe ku zarok bi we re neaxivin û bedengî û hersbûn her berdewam be; bi mamosteyan re bikevin nava têkiliyê. Heke mamoste jî sedeman nizanibin; bi psikologê dibistanan re (Schul psychologie) bikevin nava têkiliyê.

Sebir: Heta dema kemilînê

Sedem çî dibe bibe, dibe ku zarok di dema ciwanîyê de, di dema ne kemilîbûyî de, jî rêça jiyanê ku dê û bav ne hesan dibînin derkevin û bikevin nav şaşî û çewtiyên jiyane.

Lê ev yek nayê maneya têkçûna ciwanan. Divê dê û bav hinek xwe dûrî zarokan bikin û her weha pir jî nêzikê zarokan bin. Dûrbûn, nezeliqîna zarokan e. Nêzikbûn hîs dayîna parastin û hebûna dê û bavên jî bo zarokan e.

Divê ciwan hîs bikin ku dê û bav heger hewce bike herdem jî bo zarokên xwe amade ne. Û wan diparêzin. Nêzikatiyekê bi mesafe, noşdar e.

Dibe ku zarok di navbera 12-18/21 salî de heta ku ketin dema kemaletiyê, jî ber sedemên biyolojîk (dûristî/çebûna mêjûyê) li ser gotina xwe bimeşin û dijberiya gotinê de û bavên xwe bikin. Wek gelek caran tê destnîşankirin, ku di van salan de dijberiya bav û diyan xwe bikin. Ev dijberî dibe himê jînbûna kesan û mehbûna lawikan.

Nivîskarê Amerîkî Mark Twain vê demê wisa tine ser ziman: "Dema ez 14 salî bûm, bavê min jî bo min ewqas bêhêş bû ku, min jî hebûna wî şerm dikir. Lê dema ku ez bûm 21 salî, ez di nav heyretan de mam ku, ev mirovê kal çava di vê heft salê dawiyê de ewqas tişt hîn bûye".

Duzimanî ne kêmasî ye

► Ibrahim BULAK

YEKMAL ji 1993'ê û vir ve li Berlînê ji bo serwestkirin û çalakîrîna rola dî û bavan di perwerdiya zarokan de dixebite. Serkara YEKMAL'ê û pedagog Gunay Darici dibêje, di civaka Kurdan de he giringiya rola dî û bavan di perwerdiya zarokan de û perwerdeyên bi duzimanî de nehatiye fêmkirin.

Di geşedana zarokan de ziman hêmaneke sereke ye. Di qonaxa zarokatîyê de nasîna jiyân û civakê bi hêmana ziman pêk tê. Her wiha di teşegirtina rewîşt û kesayetê de ji ziman ne alavek ji rêzê ye, ew diyardeyê esasî ye. Ew diyardeya esasî ji bo zarokên penaberan nexasim ên Kurdan jiyân divê bê dabeşkirin, ji ber ku penaber herî kêr bi du zimanan pê dijin, zimanê jiyânê û perwerdeyê ne heman ziman in. Zimanê malê û dibistanê dibe ku testî-reke neerênî bike li geşedana zarokê. Li wir berpirsariyê û erkeke mezin dikeve ser milê dî û bavan. Lê ji ber ku dî û bavên Kurd, bi piranî neçûne dibistanê yan ji kêr ji derfetên perwerdeyê sûd wergirtine di pêkanîna ew berpirsariyê û erkê de qels in. Ew dixwazin vê qelsiya xwe ji bi jîholêrîkirina zimanê dayikê çareser bikin da ku zarok di navbera du zimanan de bi alozî û nakokîyê re rûbirû nebe. Di vê mijarê de Serkara YEKMAL'ê û pedagog Gunay Darici destnîşan dike ku wek sazî ew hewl didin ku bikin ku dî û bav duzimanîbûnê ji bo zarokan wek astengî nebin beravajî wek dewlemendîyê bipejirînin.

Serkar û pedagog Gunay Darici derbarê armancên saziyên xwe, rola dî û bavan de di perwerdehiya zarokan de, bi duzimanî jiyân û perwerde de pirsên me bersivandin.

YEKMAL çawa hat damezrandin? Ji bo hişyarkirina dî û bavan di perwerdeya zarokan de û di dibistanan de ji bo alîkarbûna perwerdehiya zarokan li Elmanyayê bi rola çawa rabû?

YEKMAL di sala 1993'an de bi beşdarbûna dî û bavan, bi destê pedagogên civakî û mamosteyan hat avakirin. Yekîtiya Malbatên Kurdan û Kurdistanî ye. Karê YEKMALê karekî civakî ye, ew behtirî bîst salan e ku YEKMAL li Berlînê karekî civakî dike. YEKMAL ji 2009'an ve dest pê kiriye bi karên xwe û perwerdehiyên xwe bi duzimanî pêk bîne. Me di YEKMAL'ê de ji bo zarokan deh pirtûk derxistine hinek ji wan pirtûkan ji bo zarokên dibistanan ên diçin polên yekê heta şeşan. Wekî din me sê çîrokan bi duzimanan derxistin.

Weşanên me bi Elmanî û Kurdî ne, her wiha bi du zaravayên Kurdî bi Kurmancî û Zazakî ne. Armanca YEKMAL'ê alîkarî dayîna malbatên Kurd e da ku ew ji hîni sistêmê bibin û alîkariyê bidin zarokên xwe. Gelek malbat ji ber dereng hatine bi sistêmê nizanin, wê nas nakin ji bo wê ji em ji wan re semîneran çêdikin, civînan li dar dixin, li dibistanan kar dikin. Em dixwazin ew ji bifikirin ka li vir sistemeke çawa heye, heqê wan û berpirsariyên wan çî ne bila bizanin. Pirsgrêkên me yê ziman û çanda Kurdî li ba dewletê bi awayekî fermî nayên nasîkirin.

Xebatên YEKMAL'ê heta niha çawa bandor li ser zarokan kir, her wiha li gorî zarokên bi yekzimanî perwerde dibin, vê yekê cudahiyeke çawa derxist holê?

Ya pêşî, em li dibistanan û li nav malbatan dixwazin bi reng û dengê Kurdan di nav gelan û sistêmê de xwe pênasê bikin. Ji bo vê yekê em wergêriyê dikin, bi zimanê Kurdî semîneran didin, di ala û sembolên xwe de zimanê Kurdî û Elmanî derdixin pêş. Vê çaxê zarok ji, malbat ji dibînin ku zimanê wan ji çanda wan ji di nava civakê de heye, hingê ew pirsgrêkên namîne ku bibêje "Ka ez di nav civakê de zimanê xwe, çanda xwe veşêrim û bi Kurdî xeber nedim."

Zarokên Kurdan di mala xwe de fêrî Kurdî dibin. Mamoste-



Mamoste ji zarokê Kurd dipirse, "Tu bi çend zimanan dizani?" Zarokê gotiye: "Bi Tirkî û Elmanî." Mamoste jê re gotiye "Ma tu ne Kurd î, tu bi Kurdî jî nizanî?" Zarok vê çaxê dibêje: "Ha rast e."

yekê ji min re got, min ji zarokan pirsî, "Hûn bi çend zimanan dizanin." Gelek zarokan got, "Em du zimanan dizanin." Mamoste ji zarokê Kurd dipirse, "Tu bi çend zimanan dizani?" Zarokê gotiye, "Bi Tirkî û Elmanî." Mamoste jê re gotiye, "Ma tu ne Kurd î, tu bi Kurdî jî nizanî?" Zarok vê çaxê dibêje, "Ha rast e."

Ew minakek e, lê gelek minakên wiha hene. Zarok ji nasnameya xwe vedîşê yan jî jê fedi dike. Zimanê Kurdî ji zimanan nahesibîne. Me nêzi salekê hêlînek (baxçeyê zarokan) bi duzimanî vekirîye ji bo zarokan. Em bi zarokan re bi Kurdî û Elmanî dipeyivin. Gelek zarokên ku qet bi Kurdî nizanibûn an jî di nava malê de bi tenê pê dipeyivin, êdî bi me re an jî bi kesên din re bi Kurdî xeber didin.

Zarokên Kurd ên him li welatê xwe him jî li Ewropa di warê perwerdehiyê de xwedî dezavantaj in. Ne bi zimanê xwe, bi zimanê fermî perwerde dibin. Ev rewş çawa testîrê dike li zarokan û mirov dikare çawa vê yekê saff bike?

Pirsgrêka me ya herî girîng ji ew e ku dewlet bi fermî Kurdî nas nake. Nasnameyên din çiqas ji dewletê alîkariyê bixwazin, bi dest dixin, yê wêkî Rûs, Tirk hwd. Em nikarin bi qasî wan alîkariyê bistînin. Herçî ew in, ji bo pirtûk û materyalên ji bo malbat û zarokan amade dikin, dewlet tevahiya mesrefên wan dide. Ya me wek minak me xwestibû nameyekê ji bo malbat û zarokan çawa bi Tirkî-Elmanî, Rûsî-Elmanî hene, bi Kurdî-Elmanî amade bikin, lê ew daxwaza me bi hinceta malbatên Kurdan jixwe dikarin

yan bi Tirkî yan jî bi Erebi xeber bidin, hat redkirin. Me ev yek rexne kir. Belê Kurd dibe ku bi zimanê welatên ku jê hatine zanibin, lê ev nayê wê wateyê ku pêdiviya wan bi Kurdî nîne.

Gelo li Berlînê cihê ku hûn lê kar dikin, Kurdî di dibistanan de wekê darsa bijarte tê bikaranîn?

Mixabin na. Me serlêdan kir da ku Kurdî di dibistanan de were fêrkirin. Wezîrê Karê Perwerdehiyê gazî min kir, erênî diditin. Gotin, hûn bikarin di dibistanan de bi awayekî pilot dest pê bikin, di vê navberê de hûn dikarin ji bo nûneriya Kurdî hûn dikarin bibêjin wezareta Tirkîye jî. Li eyaleta Berlînê jî bo dersên bi zimanê dayikê sefaret jî alîkariyê dikin. Me daxwaza xwe ji wezareta Tirkîye re jî ragihand lê ne erênî ne neerênî, ti bersiv nedan. Em niha amadekariyan dikin da ku ji dibistanan dersên Kurdî bidin, lê piştî dersên dibistanan em ê piştî nivro çend saetan dersê bidin. Ji pola yekemîn heta pola şeşan em ê yekê pêk binin. Me bi malbatan re civîn li dar xistin ji bo vê yekê, em hevî dikin ku di sala 2016'an de em vê projeyê pêk binin. Ji niha ve em ji bo materyal û mamosteyan bi Enstîtuya Kurdî û saziyên têkildar re dikevin têkiliyê ji ber ku projeyê pilot em ê dest pê bikin, em dixwazin karên xwe bi rêkûpêk bimeşînin. Wê zanyar jî vê projeyê bişopînin ka baş diçe an na. Soz dane me, eger proje baş bi rêve here, vê çaxê alîkariyê bidin me ji bo zimanê Kurdî.

Dê û bavên zarokên Kurd kêr derfet hebûn perwerde bibin, gelo ev yek ji bo zarokên Kurd dezavantajek e? Saziyên we ji bo vê mijarê çî kar daniye pêşiya xwe?

Ez dikarim bibêjim, bi tenê ne zarokên Kurdan xwedî derfetên dezavantaj in, gelek zarokên penaber, biyanî ewan a hemû xwedî dezavantaj in. Bivênevê zarokên Elman di warê alîkariyê jî malbatê ve xwedî avantaj in. Ez bi malbatan re gelek caran diaxivim li ser vê mijarê, dibêjin "Em bi Elmanî nizanin." Em ji wan re dibêjin, tu bi kîjan zimanî dizanî bi wî zimanî alîkariyê bide û bi zarokê re xeber bide. Mirov bi tiştêkî bizane, bi kîjan zimanê baştir dizane bi wî zimanî ji zarokê re behs bike, pirtûkan bixwîne, sohbet bike. Komeleyên yê min a ya me bi malbat û zarokan re xebateke hevpar li dar dixê. Malbat zarok tenê bi halê xwe bihêle wek minak bi telefonên û internetê tevahî zarok wextê xwe derbas bike ne tiştêkî baş e. Hinceta "Ez bi ziman nizanim nikarim" şaş e. Ez bi Elmanî nizanim, lê zimanê xwe dizanim.

Malbatên Kurd derbarê fêrkirina zimanê xwe de xemsar xuya ne, gelo li gorî we sedema vê yekê çî ye? Mirov dikare vê yekê çawa çareser bike?

Herçî li Berlîn e, zimanê Kurdî pirr bala malbatan nakêşîne. Me 2014'an helînek (baxçeyê zarokan) ji bo zarokan vekir. Di komên me de him Elmanî him Kurdî tên bikaranîn. Ne tenê zarokên Kurdan, her wiha zarokên Polon, Elman û hwd. jî hene. Heftê carekê ez diçim hêlîna zarokan malbatên Kurdan ji me re dibêjin: "Gelo em bi Kurdî xeber nedin, tenê bi Elmanî dipeyivin ne baştir e?" Yanî di mejiyê me Kurdan te tam giringiya ziman rûneniştîye. Ez ji bo tevahiya malbatan vê yekê nabêjim, lê ew pirsgrêkê hê didome. Malbat dibêjin: "Baş e, lê jixwe em li mal Kurdî bi kar tînin." Me bi malbatan re pir nîqaş kir, duzimanî ne kêmasiyeke e beravajî dewlemendî ye. Meriv zimanê dayikê çiqasî baş zanibe zimanên din ew qas baş fêr dibe. Lê êdî malbatan ji di vê yekê digihîjin. Hêlîna me vekirîye ji wek projeyê pilot e, sala were em dixwazin hêlînekê din vekin. Çend salên din jî em dixwazin li Berlînê dibistaneke duzimanî a bi navê Ewropa vekin, dibistanê ji bo malbatên Kurdan. Ew yek jî ji bo me wê bibe dewlemendîyek.

Jiyan bi Kurdî xweş e

► A. Selam BARAN**

"Zimanê biyanî wekî cilê mirovî ye. Kengê dixwazî dikarî derxî. Lê zimanê dayikê wekî çermê mirov e. Mirov nikare wê derxe..."
(C. Elî Bedirxan)

Lîgorî salên berê di hînbûna ziman de me xwe gihandîye astekê. Berî niha bi çend salan me digot "Çima em bi Kurdî neaxivîn?" An jî "Çima li ser zimanê Kurdî em ra-newestîn?" Wê demê ev pirs û sîal rast bûn û hewce bûn ku em li ser van pirsan bisekinin. Li gorî ku - çî kêm çî zêde - em li ser sekinîne, îcar pirs û pirsîrêka me di kîjan ast û radeyê de ne. Em baş dizanin ku ev çand sal qenc û xerab her mirovê Kurdî di hêla Kurdî de xwe bi pêş xistîye û li gorî hêz û qeweta xwe li ser wê mijarê sekinîye û disekine. Ev jî ji bo me kêfxweşîyek e!

Icar pirsîrêka giran û girîng ev e ku ji îro pê ve lazim e ku di her qada jiyanê de em bi Kurdî xwe bidin îfadekirin û bîkaribin di sohbetên xwe de ji bi zimanê xwe di navê teklîyan de bin. Tê ditîn ku gelek caran, gava keys bi dest dikeve û "valahiyê" digewime em xwe sist di-kîn û xwe li nav pêla zimanê Tirkî din. Erê, em bi Tirkî bizanibûn û bi-peyivîn baş e, ev ne pirsîrêkek e. Lê mebesta me ne ev

● Tu çik û guman tune ye ku em her yek ji hêla xwe ve rûmetê didin zimanê xwe û jê hez dikin. Belê bi rastî ji wisa ye! Lê çî feydeya hezkirîneke wiha zuha ji me re heye? Na, bi ya min tu feydeya wê tune ye. Hezkirin bi ked dayînê û bi hewldanê dibe. Heke em qala hezkirîneke bikin, wê çaxê berî her tiştî emê di pratîka xwe de û di rîhê xwe de bi Kurdî bijîn. Ancax bi vî rengî em dikarin qala rûmet û hezkirîneke bikin.

e. Dêrd û armanca me ew e ku em di "valahiyê" de jî bi zimanê xwe xebiridin. Dema di sohbet û têkiliyên siyâsî û nîqaşên teorîk de zor li me tê, bêtî ku em serê xwe bişînin li ser navê "ezê xwe îfade bikim" de em xwe li sinorê Kurdî diqelîblînin û berê xwe didin nav "zêvîya" Tirkî. Jixwe şaş di vir de ye. Ango di "tengasiyê" de em çima li ser benê Kurdî û Tirkî baz didin?

Di vê hêlê de em mirovên Kurdîhezkirî, heke rola xwe baş neyîzin, emê nekaribin bibin avakarekî hêvî û armançên xwe jî. A pêwîst, divê Kurdî her dem bi gawekî li pêş be. Di vir de ya girîng ew e ku mirov Kurdîya xwe ne bi Tirkî û bi zimanekî din, bi tehma Kurdî-ye-tîyê û bi Kurdî bijîn.

Zimanê me şnorê çîhana me ye

Ev karê ku em dibêjin, helbet ne karêkî jî rêzê ye. Naxerî Ev kareke zehmet û stratejîk e û ewqas jî pîroz e. Ji ber vê jî bi hewl û xeberên xwe (her çiqas di destpêkê de em berhemên mayînde neafîrîn jî), emê him û bîngêhê çandêke Kurdewarî biavêjin û bi-çînin pêşeroja xwe. Bi wê vedê û hewla xwe her yek ji me, wê bibê dilopek di nava derdê û rûpelên dîrokê de çîhê xwe bigire. Gava ez wê dibêjim; mebesta min ne ew e ku hema di destpêkê de em li ser dengzaniyê (fonetîk) û teşezaniyê (morfolojî) û he-



kurahi û dewlemendiya zimanê xwe bidin; bi nivîsê emê êş û şahiye xwe binin ziman û bi wergerê jî emê di navbera nîrxên mirovatiyê û Kurdî de pîroke çanda gelan ava bikin.

Wê gavê ya li me ferz e, emê vê karê pîroz jî ser guhên xwe neavêjin. Lewra ji vî zimanî pê ve tu zimanê me yê din jî tune. Heke em bi zimanê xwe xebiridin, jî me pê ve tu kêşê din nayên û xebir nadin. (Mînak di dîroka Çîhiyan de camêrêk bi navê Elyezer heye. Wî camêrî bi ked û hewldanê xwe, zimanê Çîhiyan ev zimanê ku êdî li ber taya mirîne de bû, rabû gotin bi gotin berhev kir û jî nû ve da zindîkirin. Zimanekî jî tunebûnê xelas kir û bi vî zimanî gelek û neteweyek ciwand hev.)

Tu çik û guman tune ye ku em her yek ji hêla xwe ve rûmetê didin zimanê xwe û jê hez dikin. Belê bi rastî ji wisa ye! Lê çî feyde hezkirîneke wiha zuha ji me re heye? Na, bi ya min tu feydeya wê tune ye. Hezkirin bi ked dayînê û bi hewldanê dibe. Heke em qala hezkirîneke bikin, wê çaxê berî her tiştî emê di pratîka xwe de û di rîhê xwe de bi Kurdî bijîn. Ancax bi vî rengî em dikarin qala rûmet û hezkirîneke bikin.

Ziman bîngêha hîzir û ramanê ye

Di dîroka mirovahiye de, jî bo ziman gelek feylesof û ramanger nêrînen xwe gotine. Ji Aristo heta Goethe her yek li ser girîngî û pêdiviya ziman ra-

û gava M. Heidegger dibêje "Ziman mala hebûnê ye", dide zanin ku nebûna ziman tunebûna me ye. Emê ancax bi zimanê xwe ve di mala xwe de, di rîh û hebûna xwe saz bikin. Gava Goethe dibêje, "Ziman wekî daristanê ye. Dar dirizin, daristan dimîne", em dizanin ku dema di jiyanê de me qewlê xwe temam kir, em nebin jî lê ev zimanê delalê hebûnê xwe dewam bikin.

Ev camêrên heja her yek tiştêkî dibêjin. Lê her gotineke wan ava heman çeman e. Herî dawî jî gotîna pêşiyên Galiyan vana hemûyan minê deryayekê li hev dicivîne û dibêje, "Neteweya bêtî ziman, neteweya bêtî dil e." Ev gotin Kovara Hawarê bi bîra me dike. Lewra C. Elî Bedirxan wisa hawar dikir: "... Miletên bîndest heyna xwe jî serdestên xwe bi du tiştan, bi qeweta du çekan diparêzin. O yek, ziman dudu. Lê heke ola mîletê serdest û bîndestiyek bibe hingî yek bi tenê ye û bînd tenê ziman e."

Em li pêşya ziman nebin asteng!

Baş tê zanin ku, zimanê Kurdî jî gelek zimanên serdest kevintir e û qewimtir e. Dîrokê vî rastîyê daye peyitandin û piştrastkirin. Ev bi hezara salan e ku zimanê Kurdî jî vî erdnigariyê derketîye û bi çî bûye. Bi navê Aranyekî, vî zimanî tove xwe li baxçê şaristanî û mirovahiye çandîye û madîriya ziman kirîye.

Ji bo hemû gelan tehma zimanê wan jî wan re xweş û şîrîn e. Ji bo me Kurdan jî wiha ye. "Hayê hayê" û "wî wî" ya dengbêjan, lorînê zêrnabêjan, ahenga lawjî û heyranokan, newa û melodiya stranên wê bi sîrûst û zindîtîya wê ve pir dewlemend û şîrîn e. Ji bo me. Tenê deng û awaza dengbêjan hejariyê tevahî senfoniye çîhanê ye. Êş û kulên me, kêf û şahiye me hemû di vî zimanî de xwe dide der. Çê û xweşiya zimanê me xwe jî lûtkeyên çîya û zozanan berdide û tî de derika guhên me de olan dide. Erê, her ziman şîrîn û xweş e lê zimanê me, jî me re hin xweştir tê. Zimanê me delaliya ber dilê me ye. Ronahiya me, hêlîna heyna me ye.

Iro, em dizanin ku bandora zimanê Kurdî her ku diçe zêde dibe. Ya ku li ser me ferz dibe, berxwedana e. Berxwedana ziman e. Jixwe ev bi hezara salan e ku ziman bi hebûna xwe li ber xwe dide. Di dîrokê de gelek ziman di nava toza dîrokê de windabûn e. Û êdî tu pêjî bi wan nakeve. Sed mîxabin! Lê zimanê Kurdî hin li ser xwe ye. Ev zimanê pîroz bi xwe re hebûna me jî parastîye. Di her qada jiyanê de û modernîteya kapitalist de jî bo ku em xwe biparêzin, lazim e di serî de em zimanê xwe biparêzin. Ev jî bi xebata ziman dibe. Berê

me digot kelemê li pêşya me dijin e, lê niha me ev qonax bihûrand. A girîng ew e ku, êdî bixwe nebin asteng û kelemên ber xwe. Ya na wê tu carî dîrok me nebeşîne.

Xewnê me yê Kurdî, azadiya Kurdî ye. Zimanê dayikê bender û stargeha me ya herî bi ewle ye. Di rastîyê de stuna ku, emê manewiyat û heyna xwe bişêrinê zimanê dayikê bixwe ye. Lewra, kevneşopî, zarogin û folklorê me û hwd. hemû di nava vî rastîyê de bi xwe re ahenek saz dike. Manewiyat jî bi nasnameya netewî ve jêrdaye ye. Ango bi gotineke din, manewiyat destpêka mirovatiya însan û wijdanê wê/wî bi xwe ye. Loma manewiyat kaniya rîh û qesergerîye me bi xwe ye. Heke rîh û mejiyê me û hebûna me Kurdî be, wî gavê wê manewiyata me jî bi Kurdî teşe bigire. Heta ku em bî zimanê xwe di nava dan û stendînekê de nebin, ewê hêlekî manewiyata me kêm û qels bimîne.

Lewra qeyd û bendên ku li pêş me hatine ciwandin, rastastîya ji bo fetisadîna me û jîbîrkirina zimanê me ne. Ji bîrkirin jî mirin e. Heke di vî hêlê de em xwe xurt nekin, ev jî pişafîna manewiyatê û ruhîyetê dide der.

Gotineke pêşyan heye, dibêje, "Kaniika ku mirov jê avê vedixwe divê mirov bisekirîne" Ango minetî û şikiriya xwe pê bine û kaniyê hin xweştir bike. Divê em nebejin, "Êdî ez hin bûme, Kurdîya min bes û tîra min e." Na gidi! Ev şaş e û kuştîna zimanê Heke em roj bi roj bi pêş nexin, min ava sekinî wê genî bibê, bîhî bide. Dema neyê bîkarînan hesin bi hesintîya xwe zîngar dibe. Icar zimanê... Tê gotin ku, rojêkî ji Konfûçyus dipirsin, "Ji bo ku tu welatêkî bi rêve bibi, tiştê ku beriya her tiştî tu biki çî ye?" Dibêje ku, "Min wê beriya her tiştî zimanê wî welatî li ber çavan derbas bikirana. Lewra dema ziman bi kêmasî û qîsûr be, pey û gotin jî dê nekaribe ramanê baş rave bike. Heke raman baş neyîn vegotin dê tiştên pêwîst jî rast pêk neyên. Ji ber vê jî tu tişt bi qasî ziman ne girîng e..."

Ev mînak jî bo me pir balkêş û watedar e. Dêrdê me ne ew e ku, em pend û şîretên bîkin û giliyên xwe bêjin. Na, dêrdê me ew e ku em hin tiştan bi bir bînin. Me di serî de jî gotibû; li gorî berê kêm zêde êdî em bi zimanê xwe diaxifin û didin distînin. Di vir de sistî heye, mesele jî ev e. Mina tûrikê çîrîyayî lazim e ku em her den tûrikê gotîne xwe bi hev re bidîrin û qewim bikin, da ku gotîne me winda nebin. Ya na jî ber vî sistbûnê, dê gotin û biwêjên me birîjn û emê mûxtacî zimanê xelkê bibin.

Gelo çend kes jî me dikare bêje ku "Ez xewn û xeyalên xwe bi tevne Kurdî dirisînim." Bila baş bê zanin ku kengî me xewnê xwe û bi Kurdî xemilandin û xeyalên xwe bi Kurdî şewrand, ew çax em dikarin bîjin ku me bi silê safî û dilrehtî, xwe jî bandora zimanê serdestan xelas kirîye. Lewra em dizanin ku jiyan bi Kurdî xweş e û em dizanin ku xewn û xeyalên bi Kurdî, azadiyêke bi Kurdî ye! Ev jî bo me Kurdan, bînkîna zimanê serdestan û şerketîna zimanê dayikê ya gelê me ye.

Em hêvdar û bendewar in ku di demên pêş de, dê jîyanek bi Kurdî bibê para jiyanê ya me ya asayî, xweşî geşî...



manê dayikê bixwe ye. Lewra, kevneşopî, zarogin û folklorê me û hwd. hemû di nava vî rastîyê de bi xwe re ahenek saz dike. Manewiyat jî bi nasnameya netewî ve jêrdaye ye. Ango bi gotineke din, manewiyat destpêka mirovatiya însan û wijdanê wê/wî bi xwe ye. Loma manewiyat kaniya rîh û qesergerîye me bi xwe ye. Heke rîh û mejiyê me û hebûna me Kurdî be, wî gavê wê manewiyata me jî bi Kurdî teşe bigire. Heta ku em bî zimanê xwe di nava dan û stendînekê de nebin, ewê hêlekî manewiyata me kêm û qels bimîne.

Lewra qeyd û bendên ku li pêş me hatine ciwandin, rastastîya ji bo fetisadîna me û jîbîrkirina zimanê me ne. Ji bîrkirin jî mirin e. Heke di vî hêlê de em xwe xurt nekin, ev jî pişafîna manewiyatê û ruhîyetê dide der.

Gotineke pêşyan heye, dibêje, "Kaniika ku mirov jê avê vedixwe divê mirov bisekirîne" Ango minetî û şikiriya xwe pê bine û kaniyê hin xweştir bike. Divê em nebejin, "Êdî ez hin bûme, Kurdîya min bes û tîra min e." Na gidi! Ev şaş e û kuştîna zimanê Heke em roj bi roj bi pêş nexin, min ava sekinî wê genî bibê, bîhî bide. Dema neyê bîkarînan hesin bi hesintîya xwe zîngar dibe. Icar zimanê... Tê gotin ku, rojêkî ji Konfûçyus dipirsin, "Ji bo ku tu welatêkî bi rêve bibi, tiştê ku beriya her tiştî tu biki çî ye?" Dibêje ku, "Min wê beriya her tiştî zimanê wî welatî li ber çavan derbas bikirana. Lewra dema ziman bi kêmasî û qîsûr be, pey û gotin jî dê nekaribe ramanê baş rave bike. Heke raman baş neyîn vegotin dê tiştên pêwîst jî rast pêk neyên. Ji ber vê jî tu tişt bi qasî ziman ne girîng e..."

Ev mînak jî bo me pir balkêş û watedar e. Dêrdê me ne ew e ku, em pend û şîretên bîkin û giliyên xwe bêjin. Na, dêrdê me ew e ku em hin tiştan bi bir bînin. Me di serî de jî gotibû; li gorî berê kêm zêde êdî em bi zimanê xwe diaxifin û didin distînin. Di vir de sistî heye, mesele jî ev e. Mina tûrikê çîrîyayî lazim e ku em her den tûrikê gotîne xwe bi hev re bidîrin û qewim bikin, da ku gotîne me winda nebin. Ya na jî ber vî sistbûnê, dê gotin û biwêjên me birîjn û emê mûxtacî zimanê xelkê bibin.

Gelo çend kes jî me dikare bêje ku "Ez xewn û xeyalên xwe bi tevne Kurdî dirisînim." Bila baş bê zanin ku kengî me xewnê xwe û bi Kurdî xemilandin û xeyalên xwe bi Kurdî şewrand, ew çax em dikarin bîjin ku me bi silê safî û dilrehtî, xwe jî bandora zimanê serdestan xelas kirîye. Lewra em dizanin ku jiyan bi Kurdî xweş e û em dizanin ku xewn û xeyalên bi Kurdî, azadiyêke bi Kurdî ye! Ev jî bo me Kurdan, bînkîna zimanê serdestan û şerketîna zimanê dayikê ya gelê me ye.

Em hêvdar û bendewar in ku di demên pêş de, dê jîyanek bi Kurdî bibê para jiyanê ya me ya asayî, xweşî geşî...

* Girtîgeha Allaga

Demokrasî ji dergûşxaneyê destpê dike

Li Elmanyayê yek ji pirsigirêkên sereke yê malbatên koçber, dergûşxane û baxçeyên zarokan ên guncaw ên ji bo zarokên piçûk in. Pedagogên Kurdistanî ên li Elmanyayê bi lez û bez, pê hisiyên ku awayê sêwirandina perwerdeyê, bi giştî ji bo zarokên piçûk û nexasim ji ji bo derdora kozmopolît û pîrmasnameyî ne guncaw e û di encamê de dikare tesîreke neerênî li zarokan bike.

Mehmet Baysal yek ji wan pedagogên Kurdistanî û ji mêj ve li Elmanyayê diji ye. Di salên 2000'î de li ser sêwirandineke guncawtir ji bo malbat û zarokên wan ên li bajarên mîna Frankfurtê kozmopolît, dihişire. Sala 2007'an bi inîsyatîfa wî, Komeleya ji bo Hindekarî, Perwerde û Întegrasyonê (EBI-Veren fuer Erziehung, Bildung und Integration) tê damezrandin, ku bi xwe bar hildigir ji bo projeya damezrandina dergûşxane (kres) û baxçeyên zarokan.

Baysal dibêje, dema wan dest bi projeyê kir, armanca wan li aliyekî azadiya zarokan bû û li aliyê din jî leza taybet ji bo zarokan a geşedana bedenî û zihnî li ber çavan bigirin. Ango di dergûşxane û baxçeyên zarokan ên EBI'yê de, bernamayeke hişk ji bo zarokan nayê amadekirin. Li şûna wê her zarok li gorî şarezatîya xwe ya û li gorî meylên xwe tê teşwîqkirin, hewl tê dayin ku weke ferd baweriyê bi xwe bine û fêr bibe ku li devera ku azadiya wî sinorên azadiya ferd û mirovên din bînpê dike, bi dawî dibe.

Naskirina 'xwe' ya zarokan

Aliyekî din ê girîng e konsepta pedagogiya EBI'yê ew e ku mîameleya xebatkaran bi hev re û mîameleya bi zarokan heta ku mumkin e, bi awayekî demokratîk tê birêvebirin. Li vir em li zehmetiyên ku koçber û zarokên wan bi wan re rûbirû dibin vegerin û girîngiya vê konseptê jî nû ve destnîşan bikin. Dema zarokeke ji malbata koçber diçe, dergûşxane yan jî baxçeyekî zarokan, pîrî caran ew yekem car e ku li derveyî malbata xwe bi rastîyeke nû re rûbirû dibe, dinyayekê din di dinya wê zarokê de hêdî hêdî cihê xwe digire. Lê bifikirin, heger ew zarok nikaribe bibe xwe (xwebûn), nikaribe ferdûna xwe bi taybetmendiyên xwe yê heylî, bi pêş bixe û geşedaneke durist û bi sihet, a fizîkî, zihnî û derûnî li ber xwe daye, zextên mezin lê dibin, heta bi rengêkî inkara wê zarokê ya heta hingê xwe li ser ferz dike û divê ew 'xwe'yeke din biafirîne. Bêguman ev pêvajoyê wê yekê ne hêsan be û li ser zarokê tesîrên mayînde jî bihêle ku dikarin tevahiya jiyana wê dewam bikin.

Baş e, dema ku mîameleya bi zarokan re bi, mîameleya perwerdakar, xebatkar û mamosteyên dergûşxane re û baxçeyên zarokan bi hev re, demokratîk be; û mîameleya zarokan a bi hev re jî bi awayekî demokratîk were teşwîqkirin hingê ne mumkin e ku ev tesîrên neerênî yê li ser zarokan werin astengkirin. EBI û dergûşxaneyên wê, bi vî îdiayê radibin û ne bi tenê ji bo koçberan jî bo tevahiya zarokan tecrûbeyekê bi vî rengî, li gorî Mehmet Baysal bawerîya bi xwe û bi kesayeta xwe ya zarokan teşwîq dike.



Luqman GULDIVÊ

Di danasîna konsepta EBI'yê de birêveberiya dergûşxaneyê weke "hiyerarşîya" uqî (pan) tê danasîn û behsa wê dike ku du kes birêveberiyê pêk tînin ku bi xwe jî dibe hevberveberî. Hem di nava komeleyê de û hem jî li dergûşxane û baxçeyên zarokan tevahiya rêveçûnan weke xebat û rêveçûnên komî (team) tînin navkirin. Herçî hiyerarşî, ne weke qebûlîkirin û rêzgirtina rola pê kesekê radibe, tê dîtîn û

mîameleya bi hev re her li ser esasekî wekhev e. Bi vî awayî tevahiya pêvajoyên pedagogîk û tedbir bi komî tînin mînaqeskirin û biryar li ser wan tê dayîn.

Dewra neerênî ya zorê

Ji ber ku zor tesîreke neerênî li zarokan dike, ev jî mijareke sereke ya konsepta pedagogîk a EBI'yê ye. Hem zora mamoste, perwerdakar û xebatkar bi kar binin û hem jî ya zarok li diji hev bi kar binin, nayê erêkirin. Bi vî awayî zora xwarinê, razanê yan jî tiştêkî din ku zarok naxwazin li wan nayên kirin. Qêrîna bi ser zarokan de, giştîkirin û gunehbarkirin her wiha ji wan xalan in ku di vî konseptê de bi ti awayî qebûl nabin. Biryarên li derveyî komê û bi serê xwe jî weke zorê tînin dîtîn û nayên qebûlîkirin, pê re jî lîdervehiştina kesekî nabe ku bibe.

Ji bo ku ev konsept karibe birêve biçe hin tedbir û qal-deyên qaişokî û hinên hişk divên. Ji van ya herî bîvênevê civînen komê û birêveberiyê yê birêkûpêk in. Di pêvajoyên biryardayîne de kom bi awayekî diyarker tevî pêvajoyê tê kirin. Rexte bi awayekî eşkere têkirin û pêşniyaz jî timî bi awayekî erênî tînin pêşwazîkirin. Li aliyê din perwerdekirina dewamî ya ferdan û ya komî jî bo mamoste, perwerdakar û xebatkarên EBI'yê bîvênevê ye. Bawerîya bi hev û destûrdayîna pirrêngiyê di nava yekbûna komê de divê werin misogerîkirin.

Dê û bav heta dema dergûşxaneyê, ew kes in ku zarok bi wan dinyayê nas dikin. Ji ber wê di jiyana zarokan de cihê gelekî girîng digirin. Bi vî hîzrê û bi wê hîzrê ku zarok her cara diçe dergûş-

xane yan jî baxçeyê zarokan weke ku biçê rêwitiyeke his dike û jê piştrast e ku her car wê vegere wî erdê ewle ku malbat, dê û bav e. Ji ber ku zarok hîna di warê xwe îfadekirinê de sinordar e, di karê perwerdekaran de têkiliya jî nêz ve a bi dê û bavan re gelekî girîng e û ji ber wê jî divê ev têkîlî elaqedarî hisa ewlebûnê û bi xwe baweriyê were xurtkirin.

Ziman û pîrzmanibûn

Di konsepta EBI de ziman û fêrkirina ziman girîng in. Nexasim têgihîştin û nasîkirina pîrzmanibûnê jî bo zarokan, teşwîqkirina derfetên pîrzmanibûnê di vî konseptê de, cihê xwe digirin. Ji ber ku ne proje û ne jî konsept duzimanî ye, di meseleya pîrzmanibûna zarokan de EBI dê û bava teşwîq dike ku bi zarokan re bi zimanê dayîkê yan jî malbatê bipeyivin da ku pîrzmanibûna zarokan misoger bike.

Trawma û koçberî

Ji ber ku tevahiya dergûşxaneyên EBI'yê li Frankfurtê ne û li Frankfurtê rêjeyekê bilind a koçberan heye, bîvênevê pîrsa, dema zarokên trawmatîk re rûbirû dibin, çawa tevdiqerin, dibe pîrseke girîng. Birêveberê komeleyê û inîsyatorê konseptê pedagog Mehmet Baysal dibêje, dema ku perwerdakar di mîameleya bi zarokê de pê dihişê ku tiştêkî bi pîrsigirêkê heye, di cihê de radigihîne û EBI hewl dide alîkariya profesyonel ji derve ve temîn bike, lewma ew ne terapyot in û bîyî terapyotekî mîameleya bi zarokên trawmatîk re dikare, rê li ber zeraerên mezintir veke.

Birêveberê EBI'yê û inîsyatorê wê Baysal derbarê serketina konsepta xwe de jî dibêje, dema ku wan sala 2009'an dest bi projeyê kir bi dergûşxaneyekê, di nava demeke kurt de destûr ji Wezareta Perwerde ya Eyaleta Hessenê girtin û karibûn di 2012'an de dergûşxaneya duyem û îsal jî dergûşxaneya sêyem vekin. Sedema wê jî ew e ku ji bo zarokan encamên bi destketî îşaret bi konseptekê serketî a dergûşxaneya dikir.

Pêkanîna konseptê li Kurdistanê

Weke birêveberê Komeleya EBI, Mehmet Baysal dixwaze konsepta xwe li Kurdistanê jî pêk bîne. Ji bo wê jî hewl danê destpêkê kirine, û lê dinîhêre ka li Mêrdîn û Diyarbekirê li kû derfetên afirandina van dergûşxaneyan hene. Mehmet Baysal li ser navê EBI'yê têkîlî danî bi şaredariyên li Kurdistanê ên wekî Mêrdîn û Diyarbekirê û jî xwe re kirîye armanç ku vê perwerdeya zarokên piçûk a dîrî hiyerarşî û bernamayên hişk, a ku azadiya zarokê li navendê datîne û hewl dide di birêveçûna dergûşxane û mîameleya bi zarokan demokratîk be, li Kurdistanê teşwîq bike. Ji bo bipêşxistina vî şewazê nihêrîna li zarokên piçûk jî dixwaze wê fikrê beriya hertîştî belav bike.



MEHMET BAYSAL



LÎ EWRÛPAYÊ REWŞA PERWERDEYA KURDÎ

Li gelek welatên Ewrûpayê yên wek Swêd, Elmanya, Holanda, Belçika, Norwec, Danîmarka, Finlandiya, Brîtanya, Fransa û Swîsreyê bi awayekî fermî dersên zimanê Kurdî tînin. Ev zêdeyî 30 salan e ku li Swêdê dersên zimanê Kurdî tînin. Ev zêdeyî 30 salan e ku li Swêdê dersên zimanê Kurdî tînin. Ev zêdeyî 30 salan e ku li Swêdê dersên zimanê Kurdî tînin. Ev zêdeyî 30 salan e ku li Swêdê dersên zimanê Kurdî tînin.


Li Elmanya dijin, dixwazim zêdetir li ser wir rawestim. Li Elmanya teqriben milyonek û sed hezar Kurd dijîn. Loma ji perwerdeya zimanê Kurdî gelekî girîng e. Ji sala 1993'an û vir de li Elmanya perwerdeya Kurdî heye. Niha li 4 eyaletên Elmanya Nordrhein-Westfalen (NRW), Bremen, Niedersachsen, Hamburg bi giştî 24 mamoste dersên zimanê Kurdî didin, nêzikî 2000 xwendekar hene.

Bi taybetî ji Kurd bêtir li NRW'ê hene. Vê gavê 8 mamoste li 14 bajar û 32 dibistanan dersên Kurdî didin. Bi tevahî hejmara xwendekaran nêzikî 1000 kesî ne.

Li bajarên Koln, Bonn, Bochum, Dortmund, Bielefeld, Duisburg, Wuppertal, Leverkusen, Oberhausen, Wesel, Dinkslagen, Senden û Herne dersên Kurdî bi fermî li dibistanan tê dayin. Xwendekar ji pola 1'ê heta ya 10'an dikarin tev li dersên zimanê dayikê bibin.

Li gorî hejmara Kurdan, zarok û ciwanên beşdarî dersên Kurdî dibin, kêman in. Ev pirsgrêk ji siyaseta dewleta Elmanya bêtir, mixabin ji xemsariya sazî û malbatên Kurd e. Bi rastî ji bo me Kurdan ziman mijara hebûn û nebûnê ye. Bi taybet ji Kurdên li Ewrûpa/Elmanya her diçe dihelin, ji çand û zimanê xwe qut dibin. Li gorî lêkolînên zanistî ji mirov li biyanîyê di nava sê nîşan de bi tevahî asimîle dibe. Dê û bav hinekî xwe ji vî xeterê diparêzin. Lê nîşanê duyem nîv ango bi tevahî tînin bişafîtin. Ji bo ku mirov pêşiyê li vî malwêranîyê bigre, divê mirov zarokên xwe bi zimanê wan perwerde bike. Zarok

Li gorî hejmara Kurdan, zarok û ciwanên beşdarî dersên Kurdî dibin, kêman in. Ev pirsgrêk ji siyaseta dewleta Elmanya bêtir, mixabin ji xemsariya sazî û malbatên Kurd e. Bi rastî ji bo me Kurdan ziman mijara hebûn û nebûnê ye.



Abdulkadir ULUMASKAN*

êdî ne li ser çand û zimanê xwe ne, yên xelkê ne. Dema ziman çû, her tişt pê re diçe.

Êdî derheqê girîngiya zimanê dayikê û bandora wî ya li ser bipêşxistina kesayet û civakî de tu nîqaş nemaye ku nehatiye kirin. Ev bi awayekî zanistî hatiye îspatkirin. Lê mixabin hê ji hin dê an bavê zarokên Kurdî di vî mijarê de dudil in û çewt nêzikî mijarê dibin.

Me 24 çar pirtûk amade kirin

Em wek saziya Mamosteyên Kurd li Ewrûpa ev bîst sal in karê perwerdeya Kurdî dikin. Ji ber ku bêyî Înstîtuya Kurd a Elmanya tu saziyên Kurd yê din zêde alikariya me nakin, em bi derfetên xwe yê kêman ji neçarî materyal û pirtûkên xwe yê dersên zimanê Kurdî amade û çap dikin. Ji bo pola 1'ê heta pola 10'a me heta îro 24 pirtûkên dersên Kurdî amade û çap kirine. Piraniya van pirtûkên dersan yê bîngehî in û hinek jî yê alîkar in, wek çîrok û hws. Ji bona wî karî komîsyonên me yê taybet hene û vî karî dimeşînin. Em bêtir metodên nûjen û Bernameya Wezaretên Perwerdeya Elman wek bîngeh digirin û li gorî vî mijarê li ser çanda Kurdî bikar tînin. Wek mînak: mijarên jiyana rojane, rûberandina jiyana wir û welêt, cêjn û rojên taybet, erdnîgarî û diroka welêt û hw.

Ji bo perwerdeya bi Kurdî kampanya

Di dawiyê de wek encam em dikarin bibêjin ku divê li seranserê Ewrûpa û bi taybetî ji li Elmanya hemû, rêxistin, sazî, malbatên Kurd kampanyakê perwerdeya zimanê Kurdî li dar bixin. An na, em dereng bîminin mixabin em ê zarok û siberoja xwe wenda bikin.

Mîre Kurdiya modern Mîr Celadet Bedirxan di vî warî de wiha dibêje: "Kuro! Eyb e, şerm bikin, an bi Kurdî bixwînin, binivîsin an jî nebêjin em Kurd in. Kurdîti bî ziman nabe, kesên bi zimanê xwe bipeyve, bixwîne û binivîse, mîfta hebûna xwe dixê bêrika xwe..."

Li ser vî bîr û bawerîyê divê em li her bajarê ku Kurd lê dijîn, Inîşiyatîf û Komelên Malbatan damezîrinin û ji bona mafê zimanê Kurdî miraceat bikin. Gava mirov di karê xwe de cîdî û bi biryar be û li gorî rêbazên vî tevbigere, tu saziyên dewleta Elman an welatekî din yê Ewrûpa ji daxwaza mirov re bê bersiv naminin. Ji ber ku li van welatan perwerdeya zimanê dayikê wek mafekî xwezayî hatiye qebûl kirin û bi zagonan hatiye misoger kirin.

Kesên di wî warî de bixwazin xebatê bikin, dikarin, xwe bi gihînin me û em ê bi dilxweşî û serbilindî tev xizmeta zimanê xwe bikin.

Ziman rûmet e, divê em li rûmeta xwe xwedî derkevin!

*Serokê Yekîtiya Mamosteyên Kurd-YMK

Rêwîtiya Moskowê

Ji mala me, heta binya gund, hema bêjî gundî giş derketibûn, wekî min bi rêkin.

Jinên gundî bi giştî digiriyan, ez paç dikirim û digotin, “De here lawo, bira xwey-kirîyê Şems bi.” Heta wan salan, xêynî ji kesên dibirin eskerîyê, kes ji gundê me neçûbû Rûsiya û seva min jî wisa digiriyan, çawa seva kesên diçûn eskerîyê.



Tosinê Reşid û birayê wî

► Tosinê Reşid

Xwedê çar zar ji dê û bavê min re hiştibûn. Ji wan sê kur Rizalî, Rostem, ez û xwişkêka me Nenê ye. Ez biçûkê malê bûm, hezkirîyê gişan. Van salên dawî, Sebra ya jîna apê min Ahmê carekê ji min re weha got: “Si salên biçûktîya min de, diya min Xezala Çolo, ez didam ser çoka xwe ji min re digot, ‘Tosin e, gul, sosin e... Kulilka mala min e...’ û bi min şa dibû.

Mêla kekê min, nivîskar, mamoste, rojnamevan Rizaliyê Reşid, di salên biçûktîyê de ser min bû. Berî ez dest bi xwendina dibistanê bikim, wî ez fêrî xwendina Kurdî kirim û şîrên Kurdî didane min da ku ez ezber bikim. Ez jî bi fêrbûna wan şîran kêfxweş dibûm û carna min ew şîr ji mezinan re jî digotin.

Apê min, Qanatê Kurdo, çend sala carekê ji Leningradê dihatê Ermenistanê, nav heval, hogir, bira û pismamên xwe. Dema di wan serdana çend rojan de, di mala me de dima. Jixwe hingê mal li zozanan bûn, diçûn zozanan jî. Min ji apê xwe yî Qanat re jî şîrê Kurdî dixwendin û ev yek gelekî bi wî xweş dihat. Ew kengî ji Leningradê bihata, ji min re diyarî dianîn. Car dibû, ez bi xwe re dibirim Yêrêvanê û ji min re kinc dikirin. Û di navbera me de nêzîkbûnek çêbû ku heta dawîya jiyana wî domand. Ji sala 1959'an, heta kirasguhêrîna Qanatê Kurdo, sala 1985'an, herî kêr, ez salê carekê diçûme Leningradê, mêvaniya wî.

Mêla wî herdem ser min bû. Gava ew sala 1954'an hat mêvaniya me, çend caran ez bi xwe re hildidam û em diçûn gerê. Dema em derketibûn gerekê ji min pirsî: “Tu dixwezî, ez te bi xwe re bibim Leningradê?” Bêyî ser bersivê bifikrim, min bi carekê ve got: “Erê, gelek dixwezim.”

Êvara wê rojê, gava mîrên malê dor sifirê rûniştî bûn, wî jî bavê min re got: “Reşid, Tosin kurekî jîr û aqil e. Xwendina vir jî hê ne baş e, heya wî, ez dixwezim bi xwe re bibim Leningradê, wê di mala min de bimîne û xwendineke baş bistîne.”

Bavê min demekê wisa bédeng li Apê Qanat nihêrî, wer dihat xuyayê ku benda gotinên wisa nînbû. Paşê vegeriya ser Qanat: “Qanat, min ê jî bixwesta kurê min li Leningradê bi zimanê Ûrisî bixwenda. Tu zanî, ez xwendinê hez dikim, lê zar e, ziman nîzane, paşê jî wê xeribîya bike.”

Apê Qanat ser ya xwe ma: “Reşit, seva ziman nefikire, nav zarê Ûrisa de wê ziman zû hin bibe. Seva xeribiyê jî, wê çendekî xeribiyê bike. Paşê wê hîni malê, zarê cîranan bibe. Hin jî ew û Wezîr wê bi hev re bin. Ez dixwezim Wezîr jî ji wî hînekî fêrî Kurdî bike.” (Gillî di derheqa kurê wî de bû.) Bavê min êdî dengê xwe nekir. Diya min, wekî tev pîrika min e Xezal û Sebra jinapa min binpiya odê rûniştî bûn, bi carekê ve dest bi girî kir.

Qanat bi devê ken vegeriya ser diya min û got, “Xezala Çolo, dema ez jî diçûm Leningradê tu digiriyayî, îcar çî bû, ez winda bûm. Hingê kesî me li wir tunebû, me qet nizanibû wê çî bê serê me. Lê niha kurê te, tê mala apê xwe, tu çî fikara diki.” Diya min di ber xwe de got, “Qanat, Tosin biçûkê malê ye, berbîna me ye.”

Bavê min, dawî van gotinan anî: “Bû, Qanat, tê kingê ji Yêrêvanê rê kevi?”

“Ez ê sê roja şûnda herim Yêrêvanê, sê roja li wir bim, du roja jî ez ê herim Çatqiran dayika xwe bibinim, deh ê mehê ez ê nivro sihet 2 bi rê kevim.”

“Tê li Yêrêvanê mêvanê Nûrê qizxal bi, ne?”

“Erê, lê çawan, xwe ez qonaxa xwe naguhêzim.”

Qanat bi beşer got, “Bû, deh ê mehê Rizaliyê Tosin bine mala Nûrê.”

Peykarê Pyotrê Mezin ser hespê, wek logoya Leningradê bû. Kesên bajar baş nizanibûn, herdem biryar didan li wir rastî hev bîn û hema bêjî kesên li Leningradê dibûn mêvan, wênayê xwe ber wî peykarî digirtin. Min û kekê xwe jî, roja 24'ê Novêmbêrê, ber peykarê Pyotrê Mezin, ev wênayê xwe kişand.



Wênaya sala 1979'ê. Yê rûniştî (ji aliyê çepê): Kekê Tosinê Reşid Rizaliyê Reşid, Qanatê Kurdo û pismamê T. Reşid. Ji piya (ji aliyê çepê) Tosinê Reşid bixwe û teniştî wî Dr. Husên Hebeş.

Dest bi tivdarekê min kirin; ji min re kincê nû kirin, kaxazên min jî dibistanê hildan, roja rêketinê zembîleke ji qisîla, ku Besa bûk çê kiribû, tîjî tîriyê ji rezê me kirin, zembîleke mezin jî tîjî fêki... Apê min, Ahmê, kavirek serjê kir, kirin zexme û bi penêrê nav toraqê û pincara malê ve sevê rê, bi min re danîn.

Roja bi rêketinê, gava min serê xwe ber xudanê malê danî û ji mal derketin, jin û keçên malê; Xezala pîrika min, diya min, Sebra jinapa min, Besa bûk û Nena xwişka min, zarê-zara wan bû, giriyan, paşê jinên mehela me ku jê re "mihela Bekiriya" digotin, giş li hewşa me berhev bûn, gişa ez paç dikirim û digiriyan.

Berî çuyinê divê min serê xwe ber ocaxa Şêx Zaharê jî daniya, paşê ji gund derketama. Ji mala me, heta binya gund, hema bêjî gundî gişk derketibûn, wekî min bi rêkin. Jinên gund gişk digiriyan, ez paç dikirim û digotin, "De here lawo, bira xweykirîyê Şems bi." Ez bi çuyina xwe gelek şa bûm, lê giriye jinan dilê min jî xirab kir, lê ji min re li hev hat xwe bigirim.

Heta wan salan, xeynî ji kesên dibirin eskeriyê, kes jî gundê me neçûbû Rûsiya û seva min jî wisa digiriyan, çawa seva kesên diçûn eskeriyê.

Trên piştî sê rojan, berbangê zû gihîştê Moskowê, em jî diviyabû êvara wê rojê bi trêne ji Moskowê biçûna Leningradê.

Me di rê de xurekên dabûn got, dixwarin, lê gava em gihîştine Xarkovê, Apê Qanat got, "Em herine xwarineke avî bixwin."

Em çûne rêstorana Vakzalê û me borşa Ukrayînî û me siya qelandî xwarin.

Em li Moskowê çûne mala hevalekî Apê Qanat. Tirî û fêkiyên bi min re dagirtibûn, me nivî dan wê malê. Keçeke wan e hevçaxa min hebû, hema wisa li dor min diçû dihat, xile bila wê bû, lê ez ji devê wê tiştêkî tê nedigihîştim. Paşê bavê wê tiştêkî ji wê re got. Keçê bi metalmayî li min nihêrî û çû qelemên reng anîn û dirêjî min kir. Min nizanibû ew keç çî dixweze û min li apê xwe nihêrî. Ape min got, "Hilde, hilde, tu mêvanî û çawa diyarî dide te."

Apê min bi beşer jî min re got. Ew beşer jî min re bû helan û min qava qelema hilda. Ez di hundirê xwe de gelek şa bûm, min cara yekemîn ewqas qelemê reng bi hev re diditin.

Trêna me berbangê zû gihîştê Leningradê. Apê Qanat



Dê û bavê Tosinê Reşid bi Qanatê Kurdo re...

taksi girt û em çûne mala wî ku li taxa 'Petrogradskaya storona', kolana 'Pionerskaya', jimara 22'an bû.

Apartmana neferê Apê Qanat lê dima, li qatê çaremîn bû. Lê apartman giş ya wî nînbû. Salên Cenga Cihanî ya Duyemîn, bajarê Leningradê gelek xirab bibû û heta dawîya salên 50'emîn sedsaliya bihurî, kêmasiya xaniyan hebû. Ji ber vê jî çend malbat di apartmanekê de bi cih kiribûn. Malbata Apê Qanat jî di apartmaneke wisan de dima. Li apartmanê tenê jûrek ya wan bû. Destav, serşok, aspêlxane yê tevayî bûn. Di jûra Apê Qanat de ew bû, jina wî Nadejda Vasilêvana, kurê wî Wezîr, ku ji min biçûktir bû û xwesîya wî a ku navê wê nayê bira min.

Gardiropa xwe hinek bi pêş de kişandin û cihê min, pişt

gardirobê, ser qutike mezin û dirêj dadanin.

Niha, gava ew her tişt dikevin bira min, ez şaş û metel diminim. Apê Qanat wan salan him mamostê zanîn-geha Leningradê bû, him jî li Enstîtûya Êtnografiyayê kar dikir. Xanima wî, Nadejda Vasilêvna Nêstêrova, li akadêmiya eskeriyê mamosteya zimanê Almanî bû. Lê ji bo ew karên xwe ye zanyarî bikin, tenê maseke kêmbêr ber baca daniyî bû.

Cihê wan her çiqas teng bû jî, dîsan jî apê min ez birim mala xwe û dixwest ez li wir bijim û bixwinim.

Di nava çend rojan de pirsgerêka dibistana min çareser kirin, ji min re çentek û pirtûkên dersan kirin.

Dibistan bi dilê min bû. Ji bo dersên xwe amade bikim, jinapa min alî min dikir, wê hinekî Kurdî zanibû.

Wisa du meh derbas bûn. Çawan dibêjin, min seva zimanê Rûsî, êdî cila xwe jî avê derdixist. Li dibistanê jî min êdî karibû bersiva mamosta bidim.

Lê meha payiza dawî, Novêmbêrê (Mijdar), gava sermê û şiliyê dan ser hev, ez nexweş ketim. Germa min gelek bilind bû. Piştî çend roja jinapa min ez birim nexweşxanê û ez heftêkê li wir mam.

Di wê navberê de apê min diçe ba doxtoran, rewşa min pirs dike. Doxtor dibêjin, wekî ez fêrî hewa Leningradê nebûme, ji min re wê gelek diwar be, dibe ku pişikê min teva xwe neynin. Piştî vî malûmetiyê, namê ji bavê min re dinvisin, wekî bîn, min bibin. Haya min jî tiştêkî tune, ez hê jî diçim dibistanê.

Rojekê jî ez hê di xewê de bûm, min deng bihistin. Min çavên xwe vekir, wa kekê min, Rizalî ber cihê min rawestiyaye. Min bi carekê ve ji nav nivîna baz da û xwe avête pêşîra wî.

Wê rojê ser taştê her tişt jî min re gotin. Apê Qanat wisa jî ji min re got, wekî êdî neçim dibistanê. Wî dixwest min û kekê min li Leningradê bigerîne.

Em bi roj gûn mûzêxanan, me peykerên Leningradê yê bi nav û deng diditin, bi êvaran jî Apê Qanat em birin şanoyê, opêrayê, balête.

Peykarê Pyotrê Mezin ser hespê, wek logoya Leningradê bû. Kesên bajar baş nizanibûn, herdem biryar didan li wir rastî hev bîn û hema bêjî kesên li Leningradê dibûn mêvan, wênayê xwe ber wî peykarî digirtin. Min û kekê xwe jî, roja 24'ê Novêmbêrê, ber peykarê Pyotrê Mezin, ev wênayê xwe kişand.

Sirûda hêviyê: Bilbilê Dilşadî

► Cemal TÎRÊJ

Taybetmendiyek Seydayê Tirêj hebû, bi bûyeran ve girêdayî bû. Dema bûyerêk pêk dihat, an pêşketineke welatparêzî, netewî bûna zû hestên wî dilivîyan. Di demeke pir kurt de bi hestiyariya kûr helbest derbarê bûyerên qewimî yên elaqedarî civak û gel de dinivîsandin.

Wê demê em li gundekî ereban dijîn. 25 salan em li wir man. Kesekî Kurd lê nebû, Seydayê Tirêj tiştê ku dinivîsand ji me re dixwend. Carnan di demeke pir kurt de ku mîna kêlî dikare were hesabandin, helbest dinivîsandin. Car caran ji demeke dirêj a bi mehan ji bo dîtina peyveke guncaw derbas dibû.

Carinan bi mehan li peyvekê digeriya

Carekê di helbestê de dixwest li ser jinên ku diçin dar û qirşan berhev dikin, binivîsine. Li peyvekê digeriya lê nedidit. Rojekê di sohbetê de jinekê got: "Min barê we yê qirşan bi weris girê da paşê bi badokê jidand." Ji çî rabû û got: "Mala te ava ev çend meh in ez li vê peyvê digeriyam." Lê belê em di wate û girîngiya tiştê dinivîsandin nedigihîştin. Gelek caran me şeva xwe bi guhdarîkirina helbestên wî derbas dikir. Dema dinivîsand diviyabû bi tenê be. Ger kesek li gel hebûya nikaribû binivîsine. Piştî ku helbesta 'Bilbilê Dilşadî' nivîsand bi salekê em hatin bajêr.

Wê demê hunermend Seîd Gabarî hebû. Seîd Gabarî hafîz e, çavên wî nabînin. Bavê min helbest li gel wî xwend wî ji jiber kir û cara yekemîn wek stran got. Lê belê piştî demeke kurt li tevahiya parçeyên Kurdistanê belav bû. Her wiha helbest tercûmeyî gelek zimanên mîna Erebî, Îngilîzî, Tirkî ji hatîye kirin. Ji ber hêza wê ya hûnerî û naverokê beyî ku dest bidin peyv an rêzîkeke bi tenê ji tim xwe bi xwe nû dike. Yanî akuel dimîne û her cara tê gotin li gor demê ye.

"Divê hêvî neqede"

Di wê demê de rêxistin an têkoşînên Kurdan tunebûn. Wê demê Şoreşa Başûrê Kurdistanê ya bi pêşengiya nemir Mele Mustafa Barzanî hebû. Gelê Kurd bi giştî bi vê şoreşê ve girêdayî bû. Ne mîna meseleke siyasî an terciha siyasî bû. Hestên Kurdewarî, neteweyî yên tevahiya Kurdan ên li çar parçeyan dibû sedem ku dilê wan bi têkoşîna Başûrê Kurdistanê ya bi pêşengiya Mele Mustafa Barzanî re lê bixwe û pê re girêdayî bin. Beriya wê ji gelek helbestên wî li ser cesaret, cengawarî û dîlpakiya Pêşmerge, Nemir Barzanî hebûn. Wê demê bizava Barzanî hêviyêke mezin li gel Kurdan çêkiribû. Dema ku şoreş şikest hêviya gelê Kurd ji şikest. Gelê Kurd bi vê têkçûnê gelekî êşîya. Helbesta 'Bilbilê Dilşadî' di wan demên dijarwar ên êş di asta herî dijarwar de ji aliyê Seydayê Tirêj ve hatîye nivîsandin. Dema helbest dinivîsand tê bîra min. Beşek jê amade kiribû, bi dengê bilind dixwend, paşê ji xwe re digot, "Na



Baş tê bîra min, nemir Cegerxwîn
gelek caran dihate cem bavê min û li
ser helbestê sohbet dikirin. Gelek
caran ji bavê min re digot, "Tirêj,
xwezî 10 helbestên min mîna 'Bilbilê
Dilşadî' xurt û tije hebûna, bila yek ji
van dîwanên min tunebûna."

kêmasî heye, hîn timam nebûye."

Hin peyv bikar dianîn, paşê digot, "Na, na ev nabe, tenê nîşandana têkçûnê û hêvînemane nabe, çî dibe bila be divê gelê Kurd bê hêvî nemîne. Ev şikestina mezin divê were vegotin lê divê hêvî ji neqede."

Aş betal 0 helbesta 'Bilbilê Dilşadî'

Bi helbesta 'Bilbilê Dilşadî' Seydayê Tirêj bû tercûmanê

êş û azarên ji ber şikestina Bizava Mele Mistefa Barzanî, lê belê di heman demê de bi peyv û rêzikên di helbestê de bicîh kiribûn, hêvî ji afirand. Bi taybetî di rêzikên mîna,

Piştê wê sitêrê bi xwe berbanga sibê ye

Wê roj hilê rohnî têkeve şûna şevê ye

Karwanê me wê bigihêje war û meqsedê ye

Çerxa felekê herdem bi fetl û ger û dewrê

Mîna di van rêzikên jor de xuya dike, Seydayê Tirêj xwestîye bi gelek hestan ji bileyize. Bi minaka 'Çerxa felekê' aliyê îtiqat û olî derdixê pêş. Dibêje, "Bila baweriya we hebe, çawa şev tê û piştî şevê roj derdikeve." Aliyekî mijarê zanistî û ilmî ye, lê li aliyê din serdema ku helbest hatîye nivîsandin mirov bi qeder, felek, çerxa felekê ji bawer in lewra dixwaze bi van têgînên olî dilqewiniyê bide gelê Kurd ku demên dijarwar, êş û azar ne mayinde ne û wê dewran biguhere rojên xweş û şahî ji werin. Mijar bi gelek alî û gelek hestan girtiye dest ku bigihîje hedefa xwe.

Disa di helbestê de rahiştina mijara, 'pesn, wesf' bi şêwazekî ye ku minakên wê tune ne.

Cegerxwîn û Seydayê Tirêj

Baş tê bîra min nemir Cegerxwîn gelek caran dihate cem bavê min û li ser helbestê sohbet dikirin. Gelek caran ji bavê min re digot, "Tirêj, xwezî 10 helbestên min mîna 'Bilbilê Dilşadî' xurt û tije hebûna, bila yek ji van dîwanên min tunebûna."

Seydayê Tirêj di rastiyê de şagirtê Seydayê Cegerxwîn e. Di bin bandora wî de maye û ji xwe re minak girtiye û ji ekola wî tê hesabandin.

Bilbilê Dilşadî yek ji wan helbestan e ku tu caran namire, nayê jibirkirin. Kengî were xwendin mirov dibêje belkî ji bo roja îro hatîye nivîsandin. Her dem û her kêlî nû ye.

Minak dibêje;

Çar hawîr me diz

û keleş in tev dane dijmin

Me ji hev radiqetînin

bir bi bir heyf û mixabin

Dema mirov tenê van her dû rêzan bixwîne dikare piştrast bike ka çiqasî li îro jî tê. Niha ji Tirkîye, Sûriye, Iraq, Iran û gelek dewletên derveyî wan jî dijminatîya Kurdan dikin. Diz û keleş ên qala wan dike ji DAÎŞê pê de kî ne gelo? Disa bi taybetî afirandin, zêdekirin û parastina hêviyê roleke girîng dileyizî di mayindebûna helbestê de. Dibêje, dibe ku niha rêş û tarî be lê nefikire ku wê wisa bîmîne, berbang were, roj derkeve û ronahî belav bibe. Disa bi îsrar hêviya serkeftinê diparêzê û bi rêzika, "Karwanê me wê bigihîje mirad û meqsedê ye" dibêje, "Çî dibe bila bibe bizanin ku wê têkoşîn bigihîje hedefa xwe û serkeftin wê bibe ya Kurdan."

Disa ji bo peyama dixwaze bide, misoger bigihîjîne gel û xwendavanên xwe hostayîyeke hunerî nîşan daye. Gelek peyvên mîna hev lê dema li pey hev tîrên rêzkirin wateyê xurt dikin bikar anîne. Di mercên normal de bikaranîna peyvên xwedî heman wateyê zêde û bêwateyî ye, lê belê dema hostayîya di helbesta 'Bilbilê Dilşadî' de em dibînin bikaranîna sê peyvên mîna hev xwezî, wate û astê sê qatan bilindtir dikin. Weke minak dibêje; "Dengê te ye xweştir ji ney û nay û bilûr e." Di vir de 'nay', 'ney', 'bilûr' her sê ji amûrên muzîkê yên bi nefes an pîfandê tîrên xistin in û hema hema mîna hev in. Heger xweşiya dengê bilbil bi dengê amûrêkê bi tenê rave bikira gelo hevqasî watedar dibû? Ne bawer im, ji ber ku li pey hev bikaranîna navê her sê amûran wateyêke zext, fahmkirîneke bêqîşûr dide. Ev yek di heman demê de xurtiya aliyê felsefîk ê helbestê jî nîşan dide.

► Resul BALTACI*

Di bin ronahiya stêrkan de
Êşê bê wext jan didin
Bêhnêk xweş ji axa sar difuriya
Û jê nûvejiyayî radibû
Bêhna axê behna azadiyê hesreta welat
Bêhna stêrkên sorgulî û çiyayê berxwedêr jin dida
Ew stêrkên sorgulî laylan didan dilê şoreşgeran.

Roj bi giştî derketibû û ber bi asîmanan ve bilind dibû. Ji serê sibê ve, Şerê di nava kedxwar û şervanê azadiyê de dom dikir. Şer li ser gir, gelî û newala belav bibû. Demsal bihar bû. Her roj barana bê wext dibariya. Jixwe meha adarê bû. Piştî Newrozê ku dagirkera qedexe kiribû li gelek cîha jin, zarok ji di nav de bi deha kes hatibûn qetilkirin. Piştî vê qetlîamê ref bi ref kom bi kom keç û xort tevî gerila dibûn. Yek ji wan jî Delil bû û dest bi nivîsandina kurtejiyana xwe kiribû. Delil bi kinasî wiha dinivîst. "Ez 15 salî me. Hêja ez pir biçûk bûm, bavê min tevî refê şoreşgerê azadiya Kurdistanê bû. Min tenê dibistana seretayî xwendiyê. Dayika min jî di nava xebatekî legal de kar dike. "Delil gelekî fikirî lê tiştêkî nehat bira wî. Nivîsa xwe pêça û da yê berpirsîyar. Roja di serê sibê fermanîdarekî gerila şervanê nû kom kirin. Dixwestin jiyana gerila, armanc û hedefê tevgerê, şer û hovitiya xwinmijan bi wan bidin fêhm kirin. Şervanên nû di heyecanek de li ser bejn û çavê Botan mêze dikirin. Botan di serî de bi xêrhatin li tevî şervana da û çu hemberî wan li piya dest bi axaftinê kir: "Hûn ji bo rûmet û azadiya gel û welatê xwe hatine. Lê vê yekê ji bîr nekin. Bihuşti jî dojeh jî di nava mirov deye, ên ku bi ronahî û rastiyê re bimeşe, wê ber bi bihûştê ve biçin. Hûn dil û mêjiyê xwe ji rastiya rojê re vekin. Hûn ber bi rastiyê ve hatin. Ev gava wê pir hêja ye. Gava yekem e. Hûn xwe bi tirêjên rojê û heqîqeta evine welat bi hev re bibin yek. Ji ber ku mirov bi zanistiya rojê tîji cîhê ku hûn hatine tê zanin. Bi dirok, çand, zîman û nîrxê gelê xwe re bijin. Rastiya xwe xef nakin. Bi rastiya xwe ve girêdayî bin. Azadiya xwe wînda nekin. Bila azadiya we bi rastiya Têvgerê bibe yek." Botan bi van hevokan dawî li gotinê xwe anin. "Ji îro û şûnde hûnê biçin perweda çekê û teorîk li wargehê cûda bibin" Piştî axaftin qediya, şervanê nû belav bûn.

Di vê navbere de gerilayê ku ji serê sibê ve çûbûn keşîfê hatibûn û rapora xwe dabûn Botan. Li ser agahiyê raporê Botan tevê gerila agahdar kiribûn. Botan dixwest ku şervanê nû ji herêma şer derxîne. Lê hêj di ser de dem derbasnebûyî di derdorê ku girê gerila lê diman, dengê çeka bilind bibû. Firok û balafirê dagirkera keminê gerila dan ber bûla. Bi çekê giran êrîş dianin ser gerila. Şer heya ber evarê dom kiribû. Ji bo şervanê nû bîn parastin Botan di hewildanekî bi wate de bû. Şervanê nû dişandin şikeftên asê. Dema şervan derbasî şikeftê dibûn, bibûn he-

Êşê bê wext

defê leşker û timên taybet. Di wê gulebaranê de Delil giran birindar bibû. Botan du gerilayê kevin û bi tecrûbe şand şikeftê. Ji bo birindaran mêze bikin û hay ji wan hebin. Ji wan gerilayan yek jê Bawer bû. Hundirê şikeftê tarî bû. Nalenala birindaran bû. Yê birîna wî herî xeter Delil bû. Bawer di wê taritiya şikeftê de alikariya wan dikir. Bawer çû li cem Delil û birîna wî yek bi yek kefiya xwe girêdida. Ji ber birîna Delil ya mil, pî û parçê ku li nava wî ketibûn, nalineki dikişand. Ji xeberdanê ketibû. Xwîn nedisekinî. Her çiqas Bawer bi kefiya xwe birin dipêçan jî, disa nikaribû pêşiya xwînê bigire. Bawer serê Delil dani ser çoka xwe, çend cara li navê wî pirsî, lê hêza ku Delil bersivê bide tunebû. Tenê xizxiz ji qirka wî dihat. Ji derve şikeftê jî şer bi tevî germahiya xwe didomîya.

Delilê hêja xortekî 13 salî bû. Bejna wî ne kin ne jî dirêj bû. Rûyê wî, mirov digot qey ji aliyê fêrîştahên heyvê hatibû şûştin. Ji ber ku kenê wî, her tim dayika wî jê re digot: "Hiva min a şevê tarî". Kena wî mîna şewqa rojê derdorê xwe ronahi dikir. Pora wî xelekî û kin bû. Rengê wî zer bû. Her du çavên wî wekî behîvên ku bi hingin hatibûn şûştin bû. Bijangên wî dirêj bûn. Her dem wekî ku bi mirov re dixivin bûn. Di nav hevalê xwe yê zaroktiyê de taybetmendîya wî ya herî xweş şopdarê tevgera azadiyê bû. Ji bo jiyaneke herikbar û zelal, bi hevalê xwe re teklîlî da-

tianî. Zû bi zû hevalên xwe nedîşikand. Hêzekî wî ya femkirin û qaneher hebû.

Hê serê Delil li ser çoka Bawer bû. Dengê wî hatibû qutkirin. Bawer bi destê xwe rû û lêvê wî yê tenik paqij kirin. Lê ji çavê Bawer stêrk dibariyan ser rûyê Delil, yê ku bê can raketibû. Bawer cihekî jê re bi destê xwe rast kir û çokê xwe bi ser cenazeyê Delil ve dakir. Gerila hêza leşkerê êrîşker şikandibû. Gelek windahî dabûn leşkeran û timên taybet. Roj ber bi dawiyê ve diçû. Sih ketibû ser çiya, gelî, gir, deşt û newalên kûr. Botan ferman da ku gerila li cihekî kom bibin. Piştî gerila kom bûn, Botan hin nasname, nivîs dan Bawer û jê re got "Tu û du hevalên din bi şervanên nû, birindar û her du hevalên şehîd ketin, bibin li cihekî guncaw veşêrin. Piştê bi tevahî şervanên nû ve biçin qempa navend". Bawer li ser vê fermana Botan dest bi amadekariyan kirin û ketin rê. Li binê dareka mazi cenazeya Delil û Cegerxwîn veşartin, deqeyekî rêz girtin û rêya xwe ya bi ber qampê ve domandin.

Bi wan re şeş birindar hebûn. Meşa wan gelekî hêdî bû. Sere nivîs saeti navberê didan meşa xwe. Bawer jî, ew nasname û nivîsên ku Botan dabûnê gaweke avête. Nasname û nivîs yek bi yek xwendin. Dema nasname û kurtejiyana Delil mēzekir, li wir sekinî. Du cara li ser hev xwend. Di nasnameya Delil de wiha hatibû nivîsandin: Nav: Delil, Navê dayikê: Bermal, navê bav: Derwêş. Li bajarê Êlihê hatiye cihanê. Emrê wî 14 salî ye." Bawer di wê keliyê de çavên wî tarî bûn. Êşekî bê sinor û bê wext avêt serê wî û heya hêza wî hebû got: "Ax Delilê min" û giriya. Şervanên nû û hevalên wî yen li dorê tev bi hev re şaş man û bi hawara wî ve çûn. Bawer tenê Delil digot û rondik ji çavên wî dihatin xwarê. Gerila yekî nasname di destê Bawer de derxist û lê mêze kir. Di nava komê de gerila yê ku zû de Bawer baş nas dikirin hebûn. Derwêş ew bi xwe bû. Delil, kurê wî bû. Heya hingê Bawer nizani. Serê wî li ser çoka wî şehîd ketî, kurê wî bi xwe bû. Dema Bawer tevî refê gerila bûyî, Delil hê çar salî bû. Bawer ma wê çaxê di vê şikeftê de di nava vê hengame û taritiyê de kurê xwe yê ku deh salibû nedîtibû wê nasbikira? Ma wê çaxê di nava wî şer û dema teng de Delil binasiya. Jixwe çend cara li navê wî pirsî lê ji ber birinê Delil giranbûn, nekari bersivê bide.

Bawer demekî dirêj li ser hişê xwe çûbû. Jê re mîna xewnekî tohil mîna zirav dihat. Bi alikariya hevalê xwe hatibû ser hemdê xwe. Bawer xwe mîna kesekî bê şans û per û baskê wî şikestibûn. Êşê bê wext li tevê bedena wî belav bibû. Bawer bêkîrîna xwe ya deh sala di dilê xwe de mîna çiyayekî mezin kiribû ji bo Delil. Lê Delil di dawa wî de şehîd ketibû.

Şerê li Kurdistanê gelek êşê bê wext bi Bawer dabûn kişandin. Ji malbata wî û hevalê wî yên pakrevan di kêleka wî de şehîd ketibûn û êşê mezin di dilê xwe de bi cih kiribû. Tevî êş, kul û derda ditibûn pahîr û mēvanê Bawer.

* Girtgeha Siwêreg

Şikestim

Ma bage kevin ji zû ve ez hilgittim
Mjin wênayek danî ser şopa fita kevokan
Ew xewnê zarokî mezin dibûn
Mjin hez ji tûgê xwegî herî nexwesik, ji dilîr
Evina gavê xwe digirt ji sûncê min ê herî xogin
Şikestim ba hilgirt

Ew berbangê dût û bi sewq
Sina min digirt bi stranek kelogirî
Zê û dîşkêm min bigre
Carek din nayê cihanê
Nagihê jiganê
Şikestim...

Muslim Aelan

